# FELSEFE

## AMADEYÎ

## 2

2019/2020

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya felsefeyê ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**- Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


BEŞA YEKEM HIN HIZIRÊN FELSEFEYÎ LI ROJHILATÊ ....................................................................................7

HIZIRA FELSEFEYÎ LI ROJHILATÊ ..............................8

ZERDEŞT 1 .........................................................................11

ZEREDEŞT 2 ......................................................................14

MANÎ ..................................................................................18

HIZIRA FELSEFEYÎ YA KEVIN LI MISIRÊ 1.............22

HIZIRA FELSEFEYÎ YA KEVIN LI MISIRÊ 2.............26

HIZIRA FELSEFEYÎ YA KEVIN LI HINDISTANÊ .....30

HIZIRA FELSEFEYÎ YA KEVİN LI ÇÎNÊ ...................35

BEŞA DUYEM FELSEFEYA YEWNANÎ ..........................41

FÎLOZOFÊN XWEZAYÊ ..............................................42

FÎLOZOFÊN HEJMARÊ PYTHAGORAS (PÎTAGORAS) .............................................................................46

SOKRATES ......................................................................52

EFLETÛN (PLATÛN 427-347) B.Z ................................56

ERISTO (ARÎSTOTALES BZ 384-322)..........................60

BEŞA SÊYEM HIN RÊBAZÊN FELSEFEYÎ.....................65

RÊBAZÊN FELSEFEYÎ 1...............................................66

RÊBAZÊN FELSEFEYÎ 2...............................................69

TÊKILIYA FELSEFEYÊ BI ZANISTÊN DIN RE .........73

BEŞA ÇAREM HIN MIJARÊN FELSEFEYÊ...................77

FELSEFEYA HEVJIYANA AZAD.................................78

FELSEFEYA HIŞ Û YA MENGÎWERIYÊ.....................82

FELESEFEYA ZANÎNÊ (EPÎSTEMOLOJÎ).................. 86
BEŞA PÊNCEM DERÛNNASÎ ........................................ 91
DERÛNNASÎ Û DESPÊKA WÊ..................................... 92
QADÊN DERÛNNASIYÊ .............................................. 96
KESAYET Û PÊKHATEYÊN WÊ ................................. 99
KARÎGERÊN KU BANDORÊ LI KESAYETA MIROV DIKIN.......................................................................... 102

# BEŞA YEKEM
# HIN HIZIRÊN FELSEFEYÎ LI ROJHILATÊ

## WANEYÊN BEŞÊ

1- Hizira felsefeyî li Rojhilatê
2- Zeredeşt (1)
3- Zeredeşt (2)
4- Manî
5- Hizira felsefeyî li Misirê (1)
6- Hizira felsefeyî li Misirê (2)
7- Hizira felsefeyî ya kevin li Hindistanê
8- Hizira felsefeyî ya kevin li Çînê

**Wane 1**

# HIZIRA FELSEFEYÎ LI ROJHILATÊ

Hizira mirovî di despêka xwe de, mîna hizirek efsaneyî û weke baweriyên olî yên yekem, dihat xuyakirin. Piştre ew efsane û baweriyên olî veguherîn hizirên felsefeyî. Ev felsefe jî di rêûresmên olî û helbestî yên ku li Mezopotamiya, Çemê Nîlê, Hindistan û Çînê derketibûn holê, dihat diyarkirin.

## Sedemên  ku hiştin felsefe li Rojhilatê bi pêş bikeve, çi ne?

Li gorî gelek jêderan, felsefeya Rojhilatê beriya felsefeya Rojavayê bû. Ji ber peydabûna derfetên jiyanî, xweza û hemû rewşên ku dihiştin felsefe li Rojhilatê bi pêş bikeve, piraniya fîlozofên Rojavayê demek dirêj li wir derbas kirine. Wan hizir û ramanên xwe ji wê deverê veguhestine Rojavayê û li wir eşkere kirine.

Zanyar **Arnold toynbee** (Arnold Twînpî) dibêje: "**Cihên herî xweş, mirovên herî kevin tê de dijiyan, lewma erdinîgariya Rojhilatê ya dewlemend bûye dergûşa mirovahiyê û bingeha felsefe û zanistê**". Her wiha Gordon Childe (Gordin Çayld) şûnwarnasê Awistralyayî jî ku bîst salan li başûrê Kurdistanê maye, li wir li şûnewaran digeriya û lêkolîn dikir. Bi gotina xwe ya navdar:  "**Tovên şaristaniya Rojavayê ji Rojhilatê des pê kir**", tekez dike ku despêkê, şaristaniyê ji Rojhilatê des pê kiriye.

## Hizira Felsefeyî li Mezopotamiyayê

Rista lêgerîna li rastiyê, çi li Rojhiltê û çi li Rojavayê, ji hezarên salan û heta niha hîn jî berdewam dike. Ji ber ku mirov her tim mereq dike û dixwaze aliyên veşartî, lêkolîn bike û nas bike.

Efsaneyên ku li Mezopotamiyayê derketibûn, nimûneyên vê rastiyê ne. Lêgerîna rastiyê bi xwe jî girêdayî pêşketina hişmendiya mirov e.

## Hin Hizirên Ku li Mezopotamiyayê Hatibûn Belavkirin:

### Mîtraîzm:

Mîtra, yek ji xwedayên herî mezin ên baweriyên pirxwedayî ye. Ew wek xwedayê rojê, yê afrînerê ronahiya ezmanî ye. Ew di nava civaka Aryenî de derketiye û hatiye pejirandin.


Mîtra

Li gorî ku diyar dibe, bi aliyê xwe yê razdar, bandor li hizira **Hermes** jî kiriye.

Baweriya Mîtrayê, ji Mezopotamiyayê derketiye û li Anatolya, Hindistan û ji Asyayê heta Ewropayê jî belav bûye.

Ramanên bingehîn ên mîtraîzmê, xwe dispêrin wekhevî, biratî û hezkirinê. Rêgezên hizirîna baş, gotina baş û xebata baş jî zagonên wê yên bingehîn in û jê ne dûr in.

Di mîtraîzma ku xwe dispêre çanda pirxweda-xwedatiyê, çanda dayîk-xwedawend û nirxên civakî yên civaka çandiniyê, giraniya xwe diyar dikirin.

Bi derketina mîtraîzmê re, di navbera êlên hûrî û gûtî de yên ku weke pêşiyên kurdan têne binavkirin, yekîtî tê avakirin.

Mîtravaniya ku weke çandeke Aryenî ye, ne tenê di nava dîrokê de, lê belê di roja me ya îro de jî, bandora xwe didomîne.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Hizira mirovî li Rojhilatê di despêka xwe de, bi çi awayî derketibû?**

2- **Baweriya mîtrayê, li ku derê belav bûye û çi bandora wê li civakê hebû?**

**Wane 2**

# ZERDEŞT 1

Zerdeşt, wek fîlozofê yekem tê dîtin. Tê texmînkirin ku Zerdeşt, di navbera salên (1000-600) B.Z de jiyaye. Li bakur-rojavayê Îranê, ku şoreşa çandiniyê tê de li pêş bû; herêma ku di navbera Gola Ûrmiye û Azerbeycanê de dest nîşan dike, ango li rojhilatê Kurdistanê ji dayik bûye.

Zerdeşt, dema dibe xort, di serê wî de gelek pirs peyda dibin. Wî digot:

"Gelo ez kî me, çima heme, jiyan çi ye, çima mirov dimire? Piştî mirinê jiyanek din heye? Kê ev asîman çêkiriye û ew stêrkên tê de, kê bi cih kirine? Ax, ba, av û agir, kê çêkirine û ji bo çi çêkirine? Xerabî û başî çi ne û çima hene?"

Rahîbên wê demê, nema dikarîbûn bersiva pirsên Zerdeşt bidin, lewma ew bi xwe ket nava lêkolînê. Di 20 saliya xwe de dikeve goşegêriyê (tenêperestî) û di çiyayekî bi navê Sabalan, li wir di şkeftekê de, dijî. Li ser pirs û lêkolînên xwe, hûr û kûr dihizire.

## Felsefeya Zerdeşt:

Zerdeşt, bi vê hevokê dest bi, felsefeya xwe kiriye:"Rast bihizire, xweş biaxive û baş pêk bîne".

Du çavkaniyên bingehîn ên ku felsefeya Zerdeşt li ser derketiye hene:

1- Pêşketinên ku Şoreşa Neolîtîkê û çanda çandiniyê, rê li ber vekirine.
2- Baweriya Mîtrayê ku îdeolojiyeke kevin a civaka Aryenî ye.

## Kengî mirov li hember koletiyê derket?

Bi derketina Zeredeşt re, yekemîn car mirov azadiya vîna xwe nas kiriye. Ev tê wê wateyê ku heta wê rojê, afrînerî tenê karê xwedê bû; êdî ev dibe karê mirovan jî, bi vîna azad felsefe derdikeve û mirov li hemberî koletiyê, derdikve.

Zerdeşt, felsefeya xwe li ser nakokiyan ava kiriye. Di felsefeya wî de, her tişt xwe dispêre bingeha dualîtiyê û di jiyanê de, her tişt bi dijberê xwe tê nasîn.

**Mînak:** Baş û xerab, tarîtî û ronahî, şev û roj, xizanî û dewlemendî, zanîn û nezanî, dijberê hev in; di nava wan de her tim, têkoşîn heye. Lewma dijber bi hev re dikarin hebin û hevsengiyê çêbikin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Zeredeşt gotiye: "Rast bihizire, xweş biaxive û baş pêk bîne", vê gotinê bi hevalên xwe re dahûrîne.**

2- **Dualîtiyê, di felsefeya Zeredeşt de, şîrove bike û bi mînakekê ji jiyanê, bide diyarkirin.**

3- **Çawa mirov dikare li hemberî koletiyê, derkeve?**

**Wane 3**

# ZEREDEŞT 2

## DI ZERDEŞTIYÊ DE ÇÊBÛNA GERDÛN Û HEBÛNÊ

Di encama nakokî û têkiliya di navbera Ahûra Mazda û Ehrîman de, afrandina gerdûnê derketiye.

**Ahûra Mazda:**

Xwedawendê çanda Rojhilatê ye û ji kevntirîn baweriyên gelê Aryenî yên wê demê ye. Ew beriya Zeredeştiyê hebû û wekî afrînerê hemû tiştên baş û başiyan, dihat nasîn. Di her qadê de nûnertiya başî, bedewî, wekhevî, paqijî, ronakbîrî û hemû nirxên civakê dike.

**Ehrîman**: Afrînerê xerabiyan e. Tê bawerkirin ku hemû xerabî û tarîtî Ehrîman, afirandine. Li beramberî her afirandinekê ku Ahûra Mazda pêk tîne, Ehrîman jî hebûneke xerab ava dike.

Gerdûn, valahiyek e ku sînorên wê nayên zanîn. Di vê valahiyê de cihekî ku nahêle şewq derbasî derveyî wê bibe heye. Ev cih, cihê giyanê baş e, ango cihê Ahûra Mazda ye; navenda başî, bedewî, zanîn, dirustî û sinc e. Ev cihê ku ji aliyê tu kesî ve nehatiye afirandin, ji mêj ve heye. Li hemû cihên ku ji derveyî vê derê ne, tarîtî serdest e; warê di bin serdestiya Ehrîman de jî cihekî ku ji aliyê tu kesî ve nehatiye afirandin û ji mêj ve heye.

Di destpêkê de tenê ev her du hêz di gerdûnê de, hebû û agahdariya wan ji hev tune bû. Ji derveyî van, tu heyîneke giyanî yan jî çêkirî tune bû.

Di felsefeya Zeredeşt de, cîhan ji çar hêmanan pêk tê û ev hêman, pîroz in: **ax, av, agir û ba.**

## Li gorî Zeredeşt mirov ji sê beşan pêk tê: laş, hiş û giyan.

Laş ji hin elementan pêk tê. Goşt û hestî ji axê ne. Piştî mirinê, laş li jêdera xwe vedigere û carek din dibe ax. Her wiha xwîn û ava di laş de jî li jêdera xwe vedigerin û carek din dibin av. Hilm ji ba ye, piştî mirinê ew jî li xwezaya xwe vedigere û dibe ba. Giyan dibe sedema tevgera laş. Hiş, piştî mirinê, dibe sedema lêpirsîn û jêpirsînan; piştî mirinê, mirov çi kiribe, bi rêya hiş, ew tişt derdikeve pêşberî wî.

## Bawerî û sincên Zeredeşt:

Zeredeşt ji çanda pirxwedayên Aryenan, Îndra, Mîtra û Varona, derbasî baweriya yekxwedayî yê bi navê Ahora Mazda dibe. Her wiha di warên çêbûna têgînên mîna: buhişt, dojeh, pir (sîrat), firişte, qatên asîman, mehşer, dadgeha mezin û terazûya qencî û xerabiyê, xwedî roleke pir mezin e.

Li gorî rewşa dîrokî, sincê Zerdeşt, di dema xwe de aştîxwaz û pêşketî bû. Li gorî Zerdeşt, divê mirov di jiyana xwe de, hevalê rastiyê be. Li hemberî mirovan nerim û dost be û ji dostan re alîkar û mêvanperwer be. Dev ji tişt û kirinên xerab û nebaş berde. Di hemû waran de piştgirtiya avakirinê bike û li hemberî xerakirinê raweste. Zerdeşt wiha dibêje; "**Di dîtin, kirin û gotinên xwe de, mirov divê paqij bin, xwediyê dilovanî û alîkariyê bin. Erdê biajon û daran nebirin, pez û dewaran xwedî bikin, li teba û lawiran xwedî derkevin û kar û barên baş bikin**."

Zeradeşt, hêz da mirov ku li dilê pak û mejiyê durist guhdar bike, li dengê azadiyê mijûl û kardar be û di navbera mirovan de, dostanî û evîntiyê biparêze. Dema ku başî zora xerabiyê bibe, wê demê di navbera mirovan de dostanî dê pêk bê.

Di dostaniyê de, başî zora xerabiyê dibe. Her wiha Zeredeşt wekî felsfeya bingehîn, qencî û xerabî bi dualîtiya tarî û rohniyê, wek hev tên dîtin.

Zerdeşt, di îdeolojiya xwe de, cudahiyeke mezin naxe navbera jin û mêran; nirxekî mezin dide jinê û hevalbendiya jiyaneke bitevger û watedar dike û her gav li hember bêmafiyê radiweste.

Ew weke tevgerek sererastkirinê ye, kevneşopiyên Ahora Mazda sererast kirine. Wî bi vê yekê bandora xwe li her sê olên yekxwedayî û hizira Bûda, Hermes û hwd, kiriye.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Bi nerîna Zeredeşt, gerdûn çawa ye?**

2- **Di felsefeya Zeredeşt de, dema başî zora xerabiyê dibe, di navbera mirovan de, dostanî pêk tê. Li ser vê gotinê, mijarekê binivîse.**

**Wane 4**

# MANÎ

## Jiyana Manî:

Di salên ku dewleta Sasanî-Iranî hatiye avakirin de û hîn imperatoriya Romayê li herêmê bi bandor bû, li Mêrdînê di cotana 216'an de, hatiye cîhanê. Gelek kes, wî weke pêxmber û fîlozofekî kurd, dipejirînin. Ji ber ku magên Zeredeşt **(yên ku ji rastiya baweriya Zerdeşt dûr ketibûn)** li hemberî ramanên Manî radibûn, vê yekê hişt ku Şahpûrê Sasanî, Manî bavêje zindanê. Lê Manî tevî şkenceyên ku lê dihatin kirin jî dev ji felsefeya xwe berneda. Lewma di sala 276'an de, hat bidarvekirin.

Navê wî yê rast nayê zanîn, her wiha bernavê wî tê wateya **kesê ronî dike.**

Manî, bi zimanê persî û syriacî (di dema Hz. Îsa de, zimanekî nêzî zimanê aramî bû) gelek pirtûk nivîsandine. Ew ji bo ola Manî bûne pirtûkên zagonî. Ev pirtûk hin ji wan hatine wendakirin û hin ji wan jî di sedsala bîstan de, hatine dîtin.



Manî

## Ol û felsefeya Manî:

**Manî**, sentezekê ji ol û baweriyên **zeredeştî, bûdî, xiristiyanî** û çanda **Hêlînîtî (Hellenic)** û hwd çêdike. Qenciyên her olekê, gihandine hev. **Aştî, hezkirin û vîn,** bingeh girtiye û weke ronahiyekê, ji bo civakê derxistiye holê. Her çi qas xwediyê cewherekî Zeredeştî be û bi dualîzma Zeredeşt bandor bûbe, lê şopên xiristiyaniyê jî di nava xwe de digire.

Bi nerîna Manî, giyan baş e û laş xerab e. Giyanê ku di laş de hatiye girtin, divê mirov wî rizgar bike û vî giyanî wekî

parçeyekî ji ronahiya xwedê bibîne. Tenê bi rêya hezkirin û başiyê, dikare ji êşê rizgar bibe. Lewra kesên ku baweriya Manî dipejirînin, bawer dikin piştî ku bimirin, dê biçin buhiştê û nema li cîhana heyberî ya ku giyanê wan di nava êşê de, girtiye vedigerin.

Di gerdûnê de, roj û heyv hene. Her wiha di her tiştî de jî parçeyekî wan an jî şewq heye. Lewra gerdûn bi temamî ne di bin kontrola tarîtiyê de ye û ji bo rizgarkirina tevahiyê, divê hemû gerdûn bikeve tevgerê.

## Hin fermanên Manî, ji bo mirovên bijartî:

**1-** Bawrî bi dîrokê û bi serdema pir xwedayan.

**2-** Divê mirov xwe ji dizî û derewan, dûr bixe.

**3-** Divê mirov xwe ji mirovên xerab, biparêze.

**4-** Divê mirov, goşt nexwe.

**5-** Divê mirov bi çavên xerab, li kesên hember xwe nenere.

**6-** Divê mirov bixwîne, da ku bigihêje rastiyê û wê ji nav hev derxîne.

**7-** Divê mirov di nav civakê de, xwedîbawerî be.

**8-** Divê mirov di karê xwe de, nesist û xemsar be.

Ev ferman û qedexe, tenê ji bo mirovên ku navên bijartî li wan hatibû kirin û hejmara wan hindik bû, hatibû danîn. Bi van fermanên xwe, ji mirovan re jiyaneke **wekhev, civakî û zirarnedayîna xwezayê**, pejirandiye.

## Girîngiya hizira Manî ji ku derê tê?

Manîtî, ji felsfe û jiyana sincî bêtir, wekî baweriyeke olî derketiye holê. Di **Rojhilata Navîn** de, mîna kevneşopiya jiyana civakî diparast.

Divê mirov, Manî wekî pêşengekî dîrokî yê **ronesansa Rojhilta Navîn,** binirxîne. Di ronîkirina şaristaniya demoqratîk de, bide jiyîn û wî wekî şervanekî mezin yê biwate jî, bi bîr bîne ku bi taybetiya civaka xwezayî û şêwazê baweriyê re, xwestiye ku nasnameyek nû bi civakê bide qezenckirin. Her wiha li hemberî imperatoriyên koledar, wijdanê mirovan bilind kiriye û di dilê gelê belengaz û lêgerîna azadiyê de, cihê xwe girtiye. Manî dixwest li şûna dogmatîzma hişk a ku di olan û koletiyê de ye, oleke hezkirinê ya gerdûnî ku tê de vîn û aqil serdest be, gelan ji hev veneqetîne û bi pêş bixe.

**Girîngiya Manî ji bo civaka kurd**: Manî, hewil daye baweriya Zeredeştî nû bike. Lê Mirov dikare Manî wekî kulîlkeke ku zû çilmisî ye binirxîne.

Ji ber vê jî, **Ocelan,** dema Manî wiha dinirxîne:

"**Eger ku sîstema wî heta roja me ya îro berdewam kiriba, wê bikarîba bibe ronesanseke pêşwext a Rojhilata Navîn. Manîtî wê ne îdeolojiyeke ku bi tenê di çawaniya olê de ba, lê dikarîbû cihê dogmatîzma olî bigirta. Pir pêwîstiya çanda Rojhilta Navîn, bi vê heye**."

**Ronîkirin:**

Hêlînîtî (Hellenistic)

Şaristaniya ku vedigere Yûnanistana kevin. Peyva Hêlînîtî ji peyva Hella hatiye. Ew jî ew navê ku Yewnaniyan li xwe dikirin, çand û şaristaniya Yewnanistanaa kevin dide diyarkirin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Manî bi taybetiya civaka xwezayî û şêwazê baweriyê, xwestiye ku nasnameyek nû bi civakê bide qezenckirin. Tu vê nerîna wî çawa dinirxîne?**

2- **Senteza ku Manî ol û felsefeya xwe li ser ava kiriye, şîrove bike.**

3- **Heke hizira Manî heta roja îro berdewam kiriba, wê ji civaka Rojava re, bibaya derman? Bi hevalên xwe re dahûrîne.**

**Wane 5**

# HIZIRA FELSEFEYÎ YA KEVIN LI MISIRÊ 1

Şaristaniya Misirê ya kevin, bi berdewamî û pêşketina hizira xwe tê naskirin, ev jî, ji ber ku Çemê Nîlê, tê re derbas dibe.

Ev şaristanî, bi zanist, wênesazî, stêrnasî, momyakirin, kîmiya, bawerî û ramanên olî yên cuda dihat nasîn. Mîna Hermes, Hypatîa û hwd. Ev bûye sedema ku gelek fîlozofên Yûnanistanî, berê xwe bidin Rojhilatê, perwerde û zanista xwe ji wir bigirin.

## Hermes:

### Hermes kî ye?

Navê Hermes, ew navê ku nivîskarên Yûnanistanî, li xwedayê Misirî **Thût (Thoth)** kiriye

Wekî terzîyekî Misirî tê zanîn. Ew di nivîsên Misirî de, weke Thûtî  derbas dibe û ew xwedayê zanînê ye.

Di jiyana hizirî û piratîkî ya Misirê de, Thût weke dahênerê nivîsê, destpêkkarê bîrkariyê, hosteyê gotinên efsûnî, afrînerê axaftinên çalakiyên xwedayî û weke afrînerê gerdûnê tê dîtin. Yekem mirovê ku bi pênûsê nivîsandiye û cil dirûtine.

### Rêgezên bingehîn ên felsefe û ola hermetîkê çi ne?

Li gorî tewriya Hermetîk a gerdûnî, li jora gerdûnê û di qata ezman de, xwedayek mezin heye; ne bi çavan tê dîtin û ne bi aqil tê têgihiştin. Gerdûn bi giştî di bin kontrola wî de ye û di ser ezman û stêrkan re ye. Her wiha cîhana heyberî û her tiştî di

nava xwe de digire. Mirov afirandiye û ev xweda bi aqil û zanînê tê naskirin.

Hermetîkê, mirov dabeşî heft beşan kiriye û her beşek bi taybetiyên xwe, girêdayî remildankeke felekî ye.

Mirov, ji laşekî heyberî û giyanekî paqij ku aqil jê der tê pêk tê. Ew her tim di nava nakokiyan de, bi daxwazên xwe re dijî, ew jî ji ber hebûna laş e. Ji bo dawîlêanîna van nakokiyan, Hermes, aqilê giştî xist navbera xweda û mirov, da ku rêya rast, bipejirîne.

**Di tewriya Hermetîkê de, mirov hebûneke ji heft astan, pêk tê:**

1- Tenduristî
2- Hêza jiyanî
3- Hêza dil
4- Giyanê lawir
5- Giyanê pîroz
6- Giyanê Aqil
7- Giyanê xwedayî

## Mirov çawa digihêje rastiyê?

Ji bo rêwiyên Hermetîkê, armanca dawî gihiştina rastiyê ye. Ji bo vê yekê jî perwerdeyek bi sê qonaxan pêk tê.

1- Perwerdekirina laş.
2- perwerdekirina giyanê lawirî.
3- Perwerdekirina giyanê mirovî.

Mirov, tenê piştî perwerdeya giyanê mirovî, dikare hêza gerdûnê ya ku nayê dîtin, baş nas bike û tê bigihêje û sûdê jê

werbigire. Bi vê yekê, dikare derûniya xwe, kontirol bike û bigihêje azadiya xwedayî.

**Em dikarin bi hin rêgezan, hizira Heremetîkê, di heyîn û gerdûnê de, bidin diyarkirin:**

Li gorî Hermetîkê, tenê bi aqil, mirov digihêje rastiyê û di nava hemû diyardeyan de, têkiliyek heye û ji hev nayên cudakirin. Hemû tişt di gerdûnê de, di nava liv û tevgerê de ne. Di navbera her tiştî de, hevsengiyek heye. Her wiha ji her sedemekê re encamek heye û ji her encamekê re jî sedemek heye. Ji her tiştî du zayend hene; ew jî nêr û mê ne û di her tiştî de dijberî jî heye.

**Bi giştî hizira felsefeyî li Misira kevin, di van xalan de diyar dibe**:

1- **Hizir**: Bingeha hebûnê ye û xweda ew afirandiye.
2- **Sinc**: Misiriyan, cudahî xistiye navbera karê baş û nebaş. Bi karê baş, mirov bi ser dikeve û bi yê ne baş jî tê sizakirin.
3- **Giyan namire**: Di nerîna Mesriyan de, giyan namire û bi mirinê, dawî li laş tê. Misiriyan bawer dikirin ku dê careke din, giyan li laş vegere, ji ber vê yekê, dest bi mûmyakirina laşê mirovê mirî, kirin; da ku xerab nebe û piramîd ava kirine.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Li gorî Hermes, mirov çawa digihêje rastiyê?**

2- **Hizira felsefeyî ya Misiriyan, bi ya Mezopotamiyayê re, hevrû bikin.**

Wane 6

# HIZIRA FELSEFEYÎ YA KEVN LI MISIRÊ 2

## HYPATIA (HEYPATIYA):

### Jiyana Heypatiya:

Fîlozof û zanyareke ku di navbera salên (370-415) de ,li Skenderiyayê jiyaye. Weke jineke bedew û berçav bû; ew nezewiciye û temenê xwe ji bo xwendin û lêkolînê pêşkêş kiriye. Bi felsefe û bîrkariyê mijûl bûye. Ew keça fîlozof, bîrkarîzan û stêrnasê navdar ,**Theon (Siyon) ê Skenderayî** ye. Theon Skenderayî bi perwerdeya keça xwe ,mijûl bûye.

Heypatiya, piştî ku, perwerdeya xwe ya bingehîn, **li Atînayê** bi dawî dike, vedigere **Skenderiyayê** û li wir dibistanekê vedike û birêveberiya pirtûkxaneya Skenderiyayê dike. Di dibistanê de waneyên felsefe, bîrkarî û stêrnasiyê dida.

Tê gotin ku, wane li ser Arîsto û platon dane û di heman demê de jî berhemên fîlozofên wê demê, şîrove û rexne kirine. Li hemberî dogmatîzma olî tê dikoşiya. Ev yek dibe sedema ku rahibên dêrê li hember wê derkevin û wê di 45 saliya wê de bikujin. Bi vê yekê, wê muhra xwe li dîroka mirovahiyê xist.



**Heypatiya**

Li navendeke ku pevçûnên dijwar lê peyda dibûn dijiya. Ji

bo ku di navbera xwendekarên wê de şerên olî pêk neyên, wiha digot:

"**Tu yek ji me naşibe yê din, lê ew tiştên ku me digihînin hev, ji wan tiştên ku me ji hev vediqetînin, pirtir in. Em hemû xwişk û birayên hev in.**"

Ev gotin bi xwe jî helwesta Heypatiya ya sincî û ramyarî, li hemberî rewşên wiha nîşan dide.

Haypatiya, berevanî di ber felsefeyê de dikir û xwe di nav dibistana ramanên Platon ên ku nû dihatin binavkirin de, didît û rêbaza bîrkariyê, li akadimiya **Atînayê** dipejirand. Bi hizira **Plotîn (Plotinus)** bandor bibû. **Plotîn** ê ku lêkolînan bi rêya vac û bîrkariyê, ji zanîna piratîkî bêtir dipejirand. Lewma **Plotîn** zagon ji xwezayê baştir, didît.

**Ji xebatên wê:**

Usturlap: **Amûra ku ji bo pîvana bilindbûna gewdeyê ezmanî, tê bikaranîn,** çêkiribû. Tê gotin ku Heypatiyayê bi xwe, xwe spartiye şîroveyên xewnan, zanista stêrkan û ezmûnên fîzîkî. Her wiha xwe li ser razên kîmyayê jî kûr kiriye. Hêjayî gotinê ye ku di qada hejmarnasiyê de, berhemeke wê ye ku li ser 13 çerman hatiye nivîsandin, heye.

Tevî vê yekê jî navê wê bi awayekî diyar, di dîroka felsfeyê û di ya zanistê de jî derbas nebûye.

Heger Haypatiya nehatiba kuştin û dibistana Skenderiyayê, nehatiba girtin, wê mirovahî bi hezarên salan berî niha, gihiştiba asta şaristaniya heyî.

Weke jineke ramandar, bi zanîn û zanebûna xwe, gel ronî dikir û rê li ber desthilatdariya rahibên dêrê, digirt.

## Ronîkirin

Usturlap: Amûreke ji bo pîvana stêrnasiyê, tê bikaranîn; bilindbûn û rewşa roj, heyv, gerestêrk û stêrkan dipîve.

Ev amûr, amûreke dîrokî ye, weke saeteke herêmî jî dihat bikaranîn.



# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Kuştina Heypatiyayê, tê çi wateyê?**

2- **Heypatiyayê gotiye: "Tiştên ku me digihînin hev, ji wan tiştên ku me ji hev vediqetînin, pirtir in". Li ser vê gotinê bihizire û bi hevalên xwe re, parve bike.**

Wane 7

# HIZIRA FELSEFEYÎ YA KEVIN LI HINDISTASNÊ

## Bûda (Sedharta Gotama) 563 – 483 B.Z:

Bûdîzm: Navê tevgereke felsefeyî û olî ye, ji aliyê **Gotama Bûda** ve hatiye damezirandin. Ew mîna felsefeya jiyana mirovên hejar û belengaz, derketiye holê. Çavkaniya herî mezin a Bûdîzmê ji xwezaniyê ya ku bi ezmûnkirin û ezmûna ronahîbûnê ya ku Bûda saz kiriye, tê nîşandan. Berî ku **Bûdîzim,** bi pêş bikeve, li Hindistanê **Brahmanîzm** hebû û weke çînekê, di nava desthilatdariyê de roleke bibandor dilîst.

Di serdema derketina Bûda de, civaka Hindistanê di nav cudahiyeke taybet de, dijiya. Di navbera çînên jêr û jor de, cudahiyeke pir mezin, hebû. Mirovên çînên jêr, nikaribûn xwe bigihînin mirovên çînên  jor.

## Jiyana wî:

Bûda, tê wateya **ronîbûyînê**. Ew kurê mîrekî Hindistanî ye. Beriya ku navê Bûda bigire, bi navê **Gotama** dihate nasîn.


Bûda

Di sedsala 6'an de derdikeve. Ew bi xwe mîrzayekî dewletê bû. Dewleta Hindistanê bi çînan ava bûbû. Sazûmaniya rahibên Hindan (Brahman), hem bi

dewlemendiyeke bêhempa, hem jî bi komên ku mîna mirovan nedihatin dîtin, hatibû avakirin.

Serdema ku ew tê de jiyaye, li Hindistanê sazûmaniyeke çînan a pir dijwar hebû. Weke ku hizirkar dibêjin, Bûda, di nava xweşî û şahiyê de, mezin bûye û hejarî nedîtiye. Piştî ku, êş û zordariya çînên bindest dibîne, bi vê yekê pir bandor dibe.

## Gelo ji bo çi Bûda dest bi lêgerîn û lêkolînê kiriye?

Bûda, ji bo çareseriya hejariyê, dest bi lêgerîn û lêkolînê kiriye. Bi pênc peyrew (mirîdên) xwe re, şeş salan li bin darekê (jê re tê gotin dara jiyanê) li benda, rênîşaneke xwedayî dimîne. Hedar (sebir) dike da ku ji ezmanan sirûş jê re were rêkirin, lê tu encam bi dest nexistiye.

Nerînên Bûda, di demeke kurt de, belav nebûn. Piştî demekê, li tixûbên Çîn û Hindistanê, tê pejirandin. Weke ku hinek hizirkar dibêjin, li Çînê zûtir bi pêş diket.

## Felsefeya Bûda:

Li gorî felsfeya Bûdîzmê, hemû tiştên ku di cîhanê de hene, di despêkê de, bi cih dibin; ango tên damezirandin, bi pêşve diçin, bi paş ve diçin, ji holê radibin û careke din ji nû ve tên zayînê. Hemû mirov, berpirsyarê tevgerên xwe ne. Ji bo giyaneke gihiştî, giyan ji laşekî, koçî laşekî din dibe; kiras diguherîne. Ev koç wiha didome heta ku giyan bigihêje Nîrvanayê.

Lêgerîna ronîbûnê û bi taybetî, xwe ji hindir ve paqijkirin, xurtkirina vîna xwe, dibe bingeha nêrîna Bûda. Ew dibêje: **"Ne bi awayekî çavkorane, lê bi awayê xwenaskirinê, mirov dikare xwe bighîne ronahîbûnê."** Xwegihandina "Nîrvanayê" weke armanceke sereke tê dîtin. Rêbaza kûrbûn û têgihîştina xwe, têrkirina zanyarî û paqijkirina hindirîn, bi rêya**"yogayê**" pêk tê.

### Nerînên bingehîn ên Bûda wiha ne:

1- Cîhan û civak, bi êşan tije ye.
2- Di bingeha êşan de, xwestek, tirs û nezanî hene.
3- Xwerizgarkirina ji wan êşan, gengaz e. Ev jî bi rêya xwegihandina ronîkirina herî bilind (**Nîrvana)** çêdibe; **Nîrvana tê wateya ronahî û dilpakiyê; ango xwerizgarkirina ji êş , azar û gihiştina asta herî bilind a paqijkirina giyanî**.
4- Rêya vê "yoga" ye. Yoga, ronakbûna bizanîn, kûrahiya hindirîn û rê û rêbazên xwegihandina, Nîrvanayê ye.

### Çend destûrên Bûdîzimê, yên jiyanê jî ev in:

1- Destê xwe dirêjî malê kesekî neke.
2- Zindiyan mekuje.
3- Tiştên nerast, mebêje.
4- Ji tiştê ku mirov serxweş dikin, dûr bikeve.
5- Ji jiyana kesên din re, rêzdar be.

Di dewleta koledar a Hindistanê de, Bûda rista herî girîng a di warê bîr û baweriyeke tund, hêvî û hezkirina jiyanê de, dilîze. Di nav êş û kulan de be jî rêya hêvî û baweriya jiyan û siberojeke paqij nîşan dike.

Nerînên Bûda, bi giranî li ser derd û kulên çîna bindest, hatibûn hûnandin û wekî berdewamiyeke sincî bû. Li gorî derfet û mercên civakê û Hindistanê jî di nav de, Bûdîzm weke çareyekê derket pêş. Felsefeya Bûda, di bingeh de felsefeyeke sincî ye.

Di Bûdîzimê de, bandorên xurt ên çanda Neolîtîkê hene û nirxekî mezin dide xwesteka jiyana azad. Felsefeya Bûda, li başûr rojhilatê Asyayê, desthilatdariya xwedatiya Birahman şikand û bandoreke berfireh lê kir.

## Ronîkirin

**Di civaka Hindistanê de, navê Birahman li kesên olî tê kirin. Civaka Hindistanê jî di nava xwe de, dibe çar qat; qata birahman, qata erustuqratan, qata bircuwazan û qata karkeran. Her qatek ji wan qatan, têkiliyê bi qata din re nake û xwe bi xwe bi hev re têkildar in. Di nava van qatan de, birahman jî qata herî bilind e.**

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Li gorî te, çima Bûda li hember xweşiya jiyana ku tê de dijiya, derket?**

2- **Nîrvana çi ye, kengî mirov digihêjê, rêya ku pê digihêjê çi ye?**

3- **Li gorî civaka ku tu tê de dijî, destûrên Bûdîzmê yên jiyanî dahûrîne.**


**Wane 8**

# HIZIRA FELSEFEYÎ  YA KEVIN LI ÇÎNÊ

Piştî ku, çanda Sumerî li Çînê derket, hêza serdestan pir xurt û li pêş ket; di bin navê xweda de, zagonên hişk datanîn û bi wan zagonên hişk, gel bi rê ve dibirin. Ji ber tundbûn û hişkbûna van zagonan, cotkar û tevaya gel, di nava metirsiyê de, dijiyan. Ji ber vê yekê, ol û felsefe ji bo sererastkirina civakê, derketin pêş. **Tawvanî** jî dibe oleke herî kevin, ji nava van olan ku ji bo kêmkirin û li hemberderketina stemkarî û zordariya serdestan, li Çînê derket. Piştre felsefeya Konfûçyûs derket.

## Tawvanî

Yek ji du tevgerên girîng ên felsefeyî-olî ku li Çînê derketine. Ji girîngtirîn damezirînerên wê **Lawizî** ye (551-479 b.z).



Lawzî

Têgeha **Taw,** tê wateya rê, sîstem û zagona gerdûnê.

Nîgara rêya ku divê bê şopandin, rêya bingehîn ya xwegihandina rastiya xwezayî ye; ango aliyê bingehîn ê nêzîkatiya xwezayê diyar dike. Bi vê gotina navdar **"Ez di kevir de razam, di şênkayê de min xewin dît, di lawir de hişyar bûm û di mirov de min rastî dît"** ev felsefe diyar dibû.

## Nerîna Taw, di çêbûna tiştan de çi ye?

Bi nêrîna Taw, hemû dijber bi nakokiyên di navbera xwe de, yekîtiyekê pêk tînin û hev temam dikin. Her wiha hevsengiyê çêdikin. Ew dibêje : "Hebûn ji nebûnê hatiye; ango yek ji wan, ji ya din derketiye û hêsanî û zehmetî ji hev ne cuda ne. Her

wiha bextewarî di dilşkestînê de ye û tişt bê şert û merc, vediguherin dijberên xwe."

Li gorî hizira Taw, her tişt piştî ku digihêje asteke herî bilind, vedigere bingeha xwe ya ku jê hatiye.

**Konfûçyûs:**

Konfûçyûs, fîlozofekî Çînî ye. Tê texmînkirin ku B.Z di navbera sedsalên (5-6) de, jiyaye. Navê wî yê resen **Kongfuzî (Konfûçyûs)** ye…

Bavê wî serleşkerekî payebilind bû.



**Konfiçyûs**

Dema ku Konfûçyûs sêsalî bû, bavê wî koça dawî kir. Ji ber mereq û hezkirina wî ya ji fêrbûnê re, ji pazdehsaliya xwe de, dest bi lêgerîna zanistê kiriye û ji nozdehsaliya xwe û şûnde, dibistanek vekiriye. Wî pir girîngî daye perwerdeyê û xwendekar perwerde kirine û wiha gotiye**:** **"Heke pilana te ya salekê be, birincê biçîne û heke pîlana te ya deh salan be, daran biçîne û heke pilana te ya sedên salan be, zarokên xwe perwerde bike"**. Bi nêrîna wî, mirovên ku hatine perwerdekirin, beriya her tiştî nirx didin dadmendiyê. Mirovên perwerdebûyî di dema ne peydabûna dadmendiyê de, heke bi wêrekî tev bigerin ,dibin mirovên serhildêr. Konfûçyûs, tu pirtûk nenivîsandine; axaftinên wî ji aliyê xwendekarên wî ve, hatine parastin û heta roja me ya îro mane.

**Felsefeya wî:**

Bingeha felsefeya wî li ser çar stûnan ava dibe; **sinc, têkiliyên civakî**, **polîtîka** û **dad**. Bingeha sinc jî li cem wî, ew hizira hezkirina mirovî ye.

Sê rêyên zanyariyê hene: Rêya yekem, hizirîn e. Mirov dikare bibêje ew rêya herî baş e.

Rêya duyem jî zanîna sînorên xwe ye.

Rêya sêyem û ya herî keddar jî lêgerîn e.

**Mirovên dilpak neh ramanên wan hene:**

1. **1-** Dema ku dinêrin, dihizirin ku zelal bibînin.
2. **2-** Dema ku guhdar dikin, dihizirin ku, baş seh bikin.
3. **3-** Ji hêla xuyakirinê ve dihizirin ku xwînşêrîn bin.
4. **4-** Di tevgerên xwe de, bi rêzdarî tev digerin.
5. **5-** Di axaftinên xwe de, dihizirin ku rastbêj bin.
6. **6-** Di karên xwe de, dihizirin ku jêhatî bin.
7. **7-** Dema ku bi guman bin, li ser pirsên xwe dihizirin.
8. **8-** Dema ku dilteng dibin, li ser pirsgirêkan dihizirin.
9. **9-** Dema ku kar dikin, li dadmendiyê digerin.

Di serdema ku **Konfûçyûs** tê de dijiya de, civaka Çînê di nav nexweşî û aloziyê de derbas dibû; nakokiyên dijwar û şerê navxweyî di nav wan de, peyda dibû. **Konfûçyûs,** ev rewş bi desthilatdariya dewletê ve girê dida û sererastkirina wê, di perwerdekirina birêveberan de, didît. Ji bo vê yekê akademî vekir û perwerde da. Li gor nêrînên Konfûçyûs:"**Eger birêveberî were rastkirin, wê sazî jî sererast bibin. Eger sazî sererast bûn, dewlet jî dê rast bibe û ji gel re xizmetê bike."** Sererastkirin û pêşveçûnên civakê, bi birêveberên durist û zane ve girê dida.

**Pênc destûrên Konfûçyûs, ên rênîşanê hene:**

1- Divê birêveber, erka xwe ya birêveberiyê, bi temamî pêk bîne.
2- Jin, li gor pêdiviyên jinan bijîn.
3- Divê kur, li gor pêdiviyên rêzdayîna bav bijîn.

4- Birayê biçûk bi temamî bi birayê mezin re, li hev were.
5- Divê her kes pêkanîna pêdiviyên hevaltiyê bizanibe û li gorî keda xwe bijî.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Bi mînakan, nerîna Taw, li ser çêbûna tiştan, şîrove bike.**

2- **Girîngiya perwerdeyê li cem Konfûçyûs bide xuyakirin û pêdiviya civakê ji perwerdeyê re, li gorî nerîna xwe, şîrove bike.**

# BEŞA DUYEM
# FELSEFEYA YÛNANÎ

## WANEYÊN BEŞÊ

1- **Fîlozofên xwezayê**
2- **Fîlozofên hejmarê**
3- **Sofîzim**
4- **Sokrates**
5- **Platon**
6- **Arîstotales**


**Wane 1**

# FÎLOZOFÊN XWEZAYÊ

Fîlozofên xwezayê; li Eyoniyayê tevgereke hizirî-zanistî ye. Ew bi armanca şîrovekirina diyardeyên xwezayî, derket û li ser heybera bingehîn û xwezayê lêkolîn da bipêşxistin. Her wiha xwest ku xwezayê ji derveyî ol û teolojiyê rave bike.

## Talîs (624-548):

**1- :** Wekî nûnerê felsefeya xwezayê tê nasîn û mîna bavê felsefeyê, tê pejirandin. Tê texmînkirin ku di sala 624'an, B.Z de, li Meletiyê ji dayik bûye û di sala 548'an de, miriye.



**Talîs**

Talîs, ne tenê fîlozof bû, lê di qada stêrnasî û bîrkariyê de jî têra xwe bi nav û deng bû.

Di 25'ê gulana 585'an de, beriya ku Rok bê girtin, pê zanî bû. Ji ber vê yekê ji gelê Eyoniyayê re, ragihand.

Wekî ku dîroknas dibêjin: **Talîs,** li Rojhilatê geriyaye û li Babil û Misirê xwendiye û zanîneke wî ya kûr û bingehîn çêbûye. Serboriya nirxên ramanî yên Mezopotamiyayê, jê re bû bingeh.

## Girîngiya Talîs ji ku derê tê?

Talîs, derveyî hizira mîtolojîk û teolojîk, cara yekem bi ezmûnkirin û çavdêriya xwezayê, nirixandin kiriye û zanîn bi pêş xistiye. Her wiha wî bi awayekî zanistî, bingeha gerdûnê şîrove kiriye. Girîngiya Talîs jî ji vê yekê hatiye.

Felsefeya Talîs, li ser du rêgezan ava dibe:
Yek: Bingeha seretayî av e; gerdûn ji avê hatiye afirandin û kaniya jiyanê, av e.
Ya duyem: Cîhan wekî xelekekê gurover e û li ser deryareke mezin radiweste.

## 2- Enkesîmendros (610-547 B.Z):

Xwendekar û hevçaxê Talîs bû û li Meletiyê ji dayik bûye.

Hin çavkaniyên dîrokî wî wekî fîlozofê yekem ku felsefe bi awayekî helbestî nivîsandiye dipejirînin. Lê ew berhemên wî hatine windakirin.

Enkesîmendros nerîna Talîs di avê de, nepijirand û dibêje: "**Bingeha gerdûnê heybereke bêdirûv, bêsînor û bêdawî ye" Wî navê Apîron lê kiriye**. "Ev heyber ji dijberên weke germ-sar, zuha-ter pêk tê.

## 3- Enkesîmenîs (558-524 B.Z):

Ji fîlozofên dibistana Mîletê ye. Dibe ku ew xwendekarê Eneksîmendros be, ji ber ku nerînên wî yên derbarê gerdûnê de, wek yên wî ne.

Wî jî weke mamosteyê xwe bawer dikir ku çavkaniya erd û ezman bêtixûb e, lê li gorî hizira wî naveroka seretayî ya erdê hewa ye.

Dibêje**: "Tevahiya gerdûnê ji aliyê hewayê ve, hatiye dorpêçkirin û yekîtiya laşê mirov jî bi alîkariya hewayê, zindî dimîne. Her wiha hemû heyînan dixe bin bandora xwe û dikeve nava wan."**

Dema ba li derdora me belav dibe, nayê dîtin, lê dema li ser hev kom dibe, dibe av. Her wiha dema gerim dibe, dibe agir.

## Heraklîtos (535-475 B.Z):

**Mirov nikare du caran di çemekî de, xwe bişo.**

**Heraklîtos Bi vê gotina xwe navdar bû.**

**Heraklîtos:** Derbarê xweza û heyînan lêkolîn û lêpirsîn kiriye. Dibêje: "Bingeha xwezayê tevgereke xwe bi xwe ye".

Tê gotin, ku wî agir weke cewhera afirandina gerdûnê dîtiye; bûyîna wî weke heybereke bingehîn dinirxîne.

Li gorî Heraklîtos, hebûn û tunebûn yekhêman in, lê belê her tiştên ku di gerdûnê de ne, di nava xwe de, hildigire. Dibêje: "Lihevhatin, du rêgezên dijber dihewîne, lê tevî dijbertiya wan, yekîtiyê di nava xwe de, diyar dikin. Heke pevçûn di tiştekî de tune be, wê çaxê ew tişt bêhebûn e. Ji ber vê yekê, Heraklîtos dibêje: "**Şer bavê hemû tiştan e".**

### Ronîkirin

**Heraklîtos dibêje: "Her tişt tê guhertin, lê tiştek tenê nayê guhertin, ew jî guhertin bi xwe ye".**

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Felsefeya Talîs, li ser du rêbazan ava bûye, şîrove bike.**

2- **Heraklîtos bi vê gotina xwe "Mirov du caran di çemekî de, xwe naşo", navdar bû. Bi hevalên xwe re, guftûgo bike.**

3- **Nerîna Enkesîmenîs di gerdûnê de, çawa bû?**

# FÎLOZOFÊN HEJMARÊ PÎTAGORAS

## Pîtagoras (570-495) B.Z:

## Pîtagorsî kî ne û ji ku derê hatine?

Pîtagoras, li girava Samos a Yûnanistanê, ji dayik bûye. Ew yek ji fîlozofên despêkê yên bi bandor in. Salên dirêj ên ciwaniya xwe, di dibistana rahibên **Misir** û **Babiliyan** de, bi perwerdeyê derbas kiriye. Piştre vegeriyaye Yûnanistanê û li wir bi cih bûye.

Di çilsaliya xwe de, Pîtagoras, berê xwe da bakûrê **Îtaliyayê** û li wê derê bi zanist û ramanên xwe navdar bû. Wî dibistanek ava kir û ev dibistan ji komên **olî û zanistî** pêk dihat. Vê dibistanê jin, mêr û neştecihên yûnan û ji bilî wan di nava xwe de, dihewand û navê **Pîtagorsî** li wan dihat kirin.

Bi giştî gelek fîlozof ji wê dibistanê derketin û li cîhanê belav bûn; nemaze, fîlozofên jin mîna **Theano (Siyano),** hevjîna Pîtagoras û her sê keçên wê **Arignote (Erîgnot)** , **Myia (Miya)** û **Damo (Damo),** ku piştî Pîtagoras, wan dibistan bi rê ve dibir.

Girîngiya vê fîlesefeyê ew e ku girêdanek di navbera xwezayê û hejmaran de çêkiriye û hejmar pîroz didît. Pîtagoras bawer dikir ku bi rêya hejmaran, her tişt tê zanîn.

## Çima Pîtagoras pir girîngî daye hejmaran?

Li gorî vî fîlozofî, koka afirandina gerdûnê hejmar e û koka her tiştî bîrkarî ye. Li cem Pîtagorasan di gerdûnê de hejmar,

heybera her tiştî ye. Her wiha hejmara yek, jêdera hemû hejmaran ne.

Pîtagoras, hejmaran pir girîng dibîne. Di baweriya wî de bi rêya taybetiyên hejmaran, her tişt tê zanîn û zanistên bîrkariyê misoger in. Armanca pîtyagorsiyan, ne tenê bîrkarî bû, lê rewşên sincî û civakî jî bûn. Li cem Pîtagoras her hejmarek di naveroka xwe de, binirx û biwate ye. Mînak: Hejmara **çar** wateya dadbûnê dide û hejmara **yek** jî wateya xweda dide. Her wiha girêdan di navbera dirûv (şekil) û hejmaran de jî çêkir.

**Mînak:** Hejmara **pênc** taybetiyên xwezayê ye, **şeş** jî jiyan û çalakî ye û hwd.

Li ser bîrkarî û muzîkê rawestiyaye û girêdanek di navbera wan de, çêkiriye.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1- Li ser felsefeya Pîtagoras, lêkolîn bike.**

**2- Girîngiya Pîtagoras, diyar bike.**

**Wane 3**

## SOFÎZIM

### Sofîzim:

**Sofîst,** bi yûnanî, tê wateya "**zana**"; kesê pendyar. Di sedsala pêncan de , ji komên fîlozofan re, **Sofîst** dihat gotin.

Bi giştî, wek kesên helbestvan û fîlozof dihatin xuyakirin.

### Derfetên derketina Sofîstan çi ne?

Di sedsala pêncan de, li Yûnanistanê , guherînên ramyarî yên girîng çêbûn. Di aliyê ramyarî û aborî de, pêvajoyeke nû dest pê kir. Bajardewletên (City state) Yûnanistanê, derbasî demoqrasiyê bûbûn û ji bo srerastkirin û birêvebirina demoqrasiyê, mirovên jîr û perwerdekirî pêwîst bûn. Ji ber vê sedemê, hinek hizirvan û mamoste li bajaran digeriyan û perwerde didan. Ji wan kesan re, **sofîst** dihat gotin. Wan kesan zanist ji wê çarçoveya teng derxistin û bi giştî belav kirin. Ji ber vê yekê, piştgirên zanista kevin li hember wan rabûn; bi nêrîna wan zanist tenê ji kesên paye bilind re ye. Di encamê de, felsefya **sofîstan** wiha derdikeve.

Bê guman, erk û armanca **sofîstan** a despêkê girîng û hêja bû, ji ber zanîn bi pêş dixistin û ronî dikirin. Weke kesên niştîmanperwer, dihatin binavkirin û pejirandin. Lê piştre sofîstan zanîn firotin û berjewendîparêzî bi pêş xistin. Wan digotin: **"Heger ji bo min baş be, rast e; heger ji bo min xerab be, ne rast e."** Nirxandin di vê çarçoveyê de, dihat kirin.

Di nav sofîstên sereke yên Yûnanistana kevin de, **Protagoras** û **Gorgiyas** gelekî navdar bûn.

## Protagoras û ramanên wî:

Beriya zayînê, di navbera salên 485-420 'an de ji dayik bûye. Ew wekî nûnerê sofîstan, dihat pejirandin.

Protagoras, felsefe û zanîna xwe li ser **guman û nerastiya sehekan,** ava kiriye. Bi pirtûka xwe ya bi navê **Xwedê** navdar bû. Li gorî zanyariyan pirtûkek wî ya din jî bi navê **Axaftina rast** hebû. Lê mixabin ev pirtûk bi demê re, ji holê rabû. Di wê pirtûka xwe de, ev gotin gotiye: "**Mirov pîvana her tiştî ye"**.

**Gorgiyas:** Berî zayînê di sedsala pêncan de, jiyaye. Wê cara pêşîn hunera retorîk (hunera gotarê) bi kar aniye.

**Gorgiyas dibêje:**

**"Tu tişt tune ye, heke hebe jî mirov tênagihêje; heke em têbigihêjin jî em nikarin ji kesekî re bibêjin û giftûgo bikin."**

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Çi wateya sofîzimê ye  û sofîst li kuderê derketine?**

2- **Sofîstên ku berjewendiyên xwe diparastin, bi çi gotinê navdar bûn?**

3- **Erk û armancên sofîstên sereke, girîng û hêja bûn. Çima?**


4- **Ramanên Gorgiyas şîrove bik.**

**Wane 4**

# SOKRATES

## Jiyana Sokrates:

Di sala 470'yê B.Z de, li **Atînayê** ji dayik bûye û di sala 399'an B.Z de, koça dawî kiriye. Yek ji fîlozofên herî bi bandor ên hemû deman e. Di demekê de ku her derê **Yûnanistanê** di nava toz û dûmanê de bû, weke berhemeke wê serdemê, li hember pirsgirêkên civakê yên ku, giran bibûn, derket. Bi danîna bingeha tewriyeke sincî, roleke dîrokî lîst .


Sokrates

Ew weke bavê felsefeya **Rojavayî** tê binavkirin.

**Sokrates**, li kuç û kolanên Atînayê digeriya, bi xelkê re li ser **ramyarî** û **sinc** diaxivî û pirs ji wan dikir. Pirsên Sokrates, gelekî balkêş bûn û ji ber vê jî xelk li derdora wî diciviyan û hewil didan li gel wî, bikevin giftûgoyê. Bi taybetî pirsên wî, gelekî bala ciwanan dikşand.

Ji ber ku baweriya xwe, bi zanînên vala û bêsûd netanî û bawerî, nirx û pêşdaraziyên civakan rexne dikir. Lewra ji aliyê deshilatdaran ve, bêbextiya ku hişê ciwanan tevlihev dike, lê hat kirin û sizaya vexwarina jehrê lê hat birîn. Çi qasî şagirtên wî hewil dan, wî ji mirinê rizgar bikin û rêya revê li ber wî vekin, lê wî mirin pejirand û bi vê yekê bû sembola felsefeyê.

## Felsefeya wî:

Bi hatina Sokrates, felsefe dabeşî du beşan bû; beşa beriya wî û beşa li pey wî. Sokrates digot: "Nezanî dayika hemû alozî û şaştiyan e, lewma dema mirov li ser karekî yan jî mijarekê bixebite, divê beriya her tiştî pêzanîn û pîvanên wî karî, yan jî wê mijarê bizanibe. Bi vê yekê, dikare rêya qenciyê ji xwe re veke."

Di vê babetê de jî bi gotina xwe ya binavûdeng: "**Xwe nas bike**", navdar bû û felsefe ji ezman anî erdê û ji hebûnê anî mirov.

Derdê Sokrates, ne ew bû ku zanîna pir bi dest bixe, lê derdê wî, çawa û ji bo çi, bi dest bixe. Zanîna ji bilî wilo, li cem wî bênirx e, ji ber ku hizirandina rast, dibe çêkera karên baş.

## Sokrates, çi rêbaz bi kar dianî?

Dayîka Sokrates, dadoka zarokan (jina ku alîkariya jinên ducanî di zayînê de dikir) bû, ji ber vê Sokrates, ji dayika xwe fêrî rêbaza zayînê bû. Sokrates bi rêya diyalogê, pirs, bersiv û danûstendinê dihişt ku ew ramanên veşartî, li cem mirovan derkevin û bizên. Mîna vê rêbaza girîng bi xwendekarên xwe re jî bi kar dianî; ji xwendekarên xwe dipirsî û bi vê rêbaza diyaliktîk, dixwest ku hizira rast bigihîne wan. Her wiha ev rêbaza diyaliktîk, li navenda felsefeyê bi cih bûye û heta niha tê bikaranîn.

Wî bi xwe tu tişt nenivîsiye, lewma her tiştê ku li ser tê zanîn, bi rêya şagirtên wî gihiştine me. Bi taybet **Platon, Kesenofonî**, **Arîstofanesî** û hin hevdemiyên wî yên ku li ser wî nivîsandine.

Tiştê ku fîlozof li ser felsefeya Sokrates li hev dikin; ew e ku Sokrates, bawer dikir ku mirov, qet ne hewcedarî lêkolîn û zanistên xwezayî ne, lê pêdiviya wan, bi gotûbêjên li ser sinc heye. Lêkolînên sincî yên Sokrates, li ser jiyana sincî û

dilpakiyê bûn. Sokrates dema ku wateya mirov û jiyana sincî şîrove dikir, ji her tiştî guman dikir, li her tiştî vedikola û rexne dikir. Yek ji baweriyên wî di vê mijarê de ev bû: "**Dema ku mirov rastbêj be, kesek nikare zirareke mezin û rasteqîne bide wî.**"

Dîsa Sokrates, wiha bawer dike ku tu kes bi vîna xwe û bi zanebûn, çewtiyan nake, heke mirov bizanibe ku tevgera wî xerab e û tê bigihêje, bêguman wiha tev nagere.

Sokrates, muhra xwe li dîrokê xist û cihekî girîng girt, ji ber ku di dadgeha xwe de, serê xwe danexist û raman û baweriya xwe parast.

**Binase:**

Axaftina **Sokrates** a dawî:

Gelî mirovên ku min bi mirinê siza kirine! Ez dixwazim ji we re, dabaşa siberojê bikim, ji ber ku di nêzîk de, ez ê bimirim. Dema saeta mirina mirovan tê, ji wan re, hêza gotina pêşerojê tê bexşkirin.

Ji we mêrkujan re, ez dixwazim vê yekê bibêjim: Piştî mirina min, cezayekî girantir li benda we ye.

Heke hûn bawer dikin ku bi rêya kuştinê, hûn ê rê li ber gotina xerabiyên xwe bigirin, hûn gelekî dixapin! Ev tevgera we, rêbazekî bêrûmet e.

Rêya herî hêsan, nexerabnîşandana mirovan e, xwerastkirin e.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Sokrates dibêje: "Nezanî dayika hemû alozî û şaştiyan e." Vê gotinê dahûrîne.**

2- **Sokrates dibêje: "Dema ku mirov rastbêj be, kesek nikare zirarek rasteqîn û mezin bide wî." Nerîna te çi ye?**

3- **Li gorî Sokrates, zanîn çawa tê bidestxistin û çi rêbazê bi kar tîne? Nerîna xwe bîne ziman.**


# PLATON (427-347) B.Z

**Jiyana wî:**

Li Atînayê ji dayik bûye. Ew endamê malbatek orustuqratî û xuya bû. Ew şagirtê Sokrates bû û gelekî pêve girêdayî bû. Ji ber vê yekê, dema Sokrates hate kuştin bi dilekî şkestî, dest ji welatê xwe berda. Di çilsaliya xwe de, vegeriyaye welatê xwe.

Di wan nozdeh salan de, li **Megara**, **Misir**, **Sicîlya** û li **îtalyaya başûr** geriyaye.

Piştî hatina **Atînayê**; akadimiya yekem ava kir û li wir wane didan şagirtan û dest bi nivîsandina berhemên xwe kir. Ew jî weke Sokrates, rêbaza gotûbêjê (dîyalog) bingeh girt.



Platon

**Platon,** di serdema pêşîn de, yek ji wan fîlozofên girîng ên ku di waneyên xwe de, rêbaza gotûbêja diyliktîkî bi kar aniye. Wî hewl dida ku hezkirina zanistê fêrî şagirtan bike.

**Berhemên wî yên sereke jî ev in:**

1- Komara Platon: Di vê pirtûka xwe de, dabaşa bajarê nimûneyî dikir ku tê de civak dabeşî qatan kiribû.
2- Gotûbêj (diyalog).
3- Yasa (zagon).
4- Parastina Sokrates.

**Platon**, felsefe bi bidesxistina zanînê, bi awayekî giştî da nasîn. Her wiha bi rêya aqil tenê, têgihiştin çê dibe û rastî jî tê bidesxistin. Girîngî daye gelek mijarên mirovî, mîna **zanîn**, **heyîn**, **sinc û** hwd.

## Felsefeya zanînê:

Platon, bawer dike ku mirov ji zayîna xwe ve, xwediyê zanistê ne. Her wiha bawer dike ku giyan berî ku derbasî laş bibe, di cîhana mengî de bû, piştre zîvirîye cîhana me. Wî bawer dikir ku mirov, tiştên ku ji bîr kiriye jî di dema jiyana wî de, tê bîra wî.

Tewriya wî ya bîranînê, xwe dispêre tewriya wî ya du cîhanan (**cîhana fîzîkî yan a pêhisînan û cîhana mengî**, ji ber ku bi sehekan nayê têgihiştin, bi aqil tê zanîn.

Forma her heyînekê heye; heta forma heyînên razber jî heye.

**Mînak:** Çawa ku form û mengiya darê, pel û ya rengê sor heye; ya başî û dadmendiyê jî heye.

## Platon zanînê dike sê beş:

1- **Zanîna rast** (mengî)
2- **Zanîna çewt** (pêhisîn).
3- **Bawerî**: Bawerî, di navbera zanîna rast û ya çewt de ye.

Di encamê de, tê xuyakirin ku **pêhesîn**, zanînên çewt dide me û zanîna rast, bi rêya **aqil** tê hilberandin.

## Felsefeya heyînê:

**Platon** gotiye: "Du cîhan hene: cîhana mengîwerî û cîhana xuyakirî, ango qelp (cîhana pêhesînan). Hemû heyînên ku li cîhanê hene, ew kopiyên (lasayîkirin) heyînên resenî ne, hêz û hebûna xwe jî ji wan digirin. Lewma jî cîhana resen û mayinde, cîhana **mengîwerî** ye.

Li gorî **Platon**, di cîhana mengîwerî de, hemû heyîn mayinde ne û nayên guhertin. Ew bi aqil têne têgihaştin. Lê cîhana xuyakirî **ango** ya pêhesînan, tê de hemû tişt dimirin û ji holê radibin.

**Mînak:** Mirov dimirin û ji holê radibin, lê hizira mirov tu caran namire.

Raman nayên guherîn, lê lasayîkirinên wan, hertim tên guhertin û ji holê radibin.

**Felsefeya sincî:**

Li gor felsefeya Platon, başî dibe armanca jiyana mirovatiyê û bingeha heyîn û zanînê û bextewarî jî di başî û zanînê de ye. Başî, ew tiştê ku hemû kes wê dixwazin.

Platon, dema ku li ser pirsgirêkekê mijûl dibe, ne tenê **kesan**, lê **civakê** bi giştî, di ber çavên xwe re derbas dike; ji xwe re wekî pîvan û nimûneyê dibîne.

Di felsefeya wî de, başî di asta herî bilinde ye, ji tevliheviya **zanîn** û **kêfê** pêk tê. Her wiha tevlihevî jî li gorî pîvana spehiyê, rastiyê çê dibe.

Li gorî nêrîna wî dilpakî ew **aheng**, **rastî** û **birêkûpêkiya giyan e**.

Xerabî jî, xerabbûna vê rêkûpêkiyê û ahengê ye. Mirov çi qasî dilpak be, ew qasî azad e, Lewma giyanê mirovekî wiha, ji aliyê aqilê wî ve, tê kargerandin, ji ber aqilê wî serewer, xwedîpîvan û aram e.

Em dikarin feslsefeya Platon, ya sincî wiha binirxînin: Pilaton, li aliyekî girîngiyê dide sinc û cîhana mengîwerî û li aliyekî din jî di pirtûka xwe de, ya bi serenavê Komara Platon, civakê parçe dike û dike çîn. Bi vê yekê, bi xwe re dikeve nakokiyê; sîstema koletiyê dide pêş û dûrî dadmendiya civakî dikeve.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1- Li gorî Platon, zanîn kengî li cem mirov derdikeve.**

**2- Felsefeya heyînê li cem Platon, şîrove bik.**

**3- Platon dibêje: "Başî, ew tiştê ku her kes dixwaze." Li gorî te, başî çi ye?**

Wane 6


# ARÎSTOTALES (384-322 B.Z)

**Arîstotalîs**, li **Stagarasê** ji dayik bûye. Ew afrînerê felsefeya ramana serdema klasîk ê herî mezin e. Di hifdehsaliya xwe de, berê xwe daye Akadimiya Platon û perwrdeya xwe li wir dîtiye. Ew şagirtê **Platon** e û mamosteyê Îskenderê mezin e. Wî girîngî daye perwerdeyê, lewra perwerdeya Arîsto, sedemek ji sedemên serkeftina Îskender, tê dîtin.

Di sala 335'an ê B.Z de, li Atînayê, dibistanekê bi navê Lykiyon vedike. Li ser fîzîk, helbest, vac, polîtîka û biyolojiyê gelek berhemên wî hene û li ser gelek mijaran nivîsiye. Mîna: sinc, zanayî û hwd.

## Felsefeya Arîstotales:

Arîsto, nêrînên felsefeyî yên beriya xwe komî ser hev û berfirehtir kiriye. Bi kûrahî çavdêriya xwezayê kiriye û tê de mijûl bûye.


Arîstotales

Di felsfeya xwe de, cudahiyê naxe navbera hiş û hestan de û dixwaze di navbera hiş, hest û pêhisînan de, yekîtiyekê çêke.

Ji ber ku dixwest, hemû zanînên di dema xwe de, kom bike ser hev, bêyî ku civak û xwezayê ji hev cuda bike, ew hewildana wî, dibe rêbaza gelemperîbûnê û bi xwe re rêbaza mentiqê (vac) ya ji giştîhatinê (deduction) bi pêş dixe.

Ev dibe vaca Arîsto ku heta roja me ya îro jî xwedîbandor e.

**Mînak:** Ji her tiştî re tê gotin an **reş** an **spî** ye, bêyî ku nêrîna sêyem hebe.

Vaceya Arîsto, ne tenê di serdema klasîk de, lê di hemû serdeman de, bandora xwe kiriye.

Arîsto, Xweda mandele nake û wî weke sedema destpêka hebûnê, dibîne. Lewra di zagona xwe de, dibêje:" **Her tişt vedigere sedema yekem (Xweda) ango bi xweda re dibe yek.** Zagona ku dibêje: Ji her tiştî re sedem û armancek heye, zagoneke Arîsto ye û bi vê yekê re jî dibe xwedayî.

## Felsefeya sincî:

Arîsto, wiha dihizire ku hemû tişt ber bi başiyê ve diçin. Sincdarî, ne ew tevgerên me yên ku ji ber xwe ve baş in, lê sincdarî mirov nêzîkî tiştên baş, dike.

Li gorî baweriya Arîsto, mebesta jiyanê bextewarî ye, lê bextewarî ne tiştekî têgihanî (amade) ye. Ew tiştekî wiha ye ku mirov di hemû jiyana xwe de, dikare xwe bigihînê.

Di jiyanê de, ew kesên ku xwediyê pisporiyeke diyar in, encex ew dikarin bigihêjin bexteweriyê. Bextewerî jî **çalakiya giyan e** ku jiyaneke pispor, didomîne. Xweşî jî temamker û encama hemû çalakiyan e; xweşiya herî bilind jî bi raman û tevgerên sincî pêk tên.

**Arîstotales**, weke qonaxeke mezin tê nirxandin; ê ku di felsefeya baweriyê ya bawermend de jî dijî, ew bi biçûk nayê dîtin. Lê ji ber nerînên wî yên neyinî yên derbarê jinê de; ku bi çavên biçûk lê nêriye û rola wê di jiyanê de kêm dîtiye, dibe cihê rexneyê. Heke Aristotales dîroka pêşketina mirovahiyê şopandiba, wê zanîba ku rola jinê, di pêşxistin û birêvebirina civakê de pir girîng bû. Her wiha asta Aristotales a agahdarbûnê

ji mêj ve hatiye derbaskirin, ji ber vê yekê jî ji Arîsto derbasbûn çênebe, têgihiştina şêweyê raman û zanîna dema me, negengaz e.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Li gorî Arîstotales, bextewariyê şîrove bike. Nerîna xwe jî di bextewariyê de, diyar bike.**

2- **Vaca (mentiqa) Arîstotales, di her tiştî de, yan reş yan jî spî ye. Tu mentiqê wî, çawa dinirxînî?**

# BEŞA SÊYEM
# HIN RÊBAZÊN FELSEFEYÎ

## WANEYÊN BEŞÊ

1- Rêbazên felsefeyî 1
2- Rêbazên felsefeyî 2
3- Têkiliya felsefeyê bi zanistên din re

**Wane 1**

# RÊBAZÊN FELSEFEYÎ 1

## Rêbazên ku felsefe bi kar tîne:

Rêbaz weke têgeh, tê wateya rê û rêzanên ku mirov ji bo gihaştina armancekê, bi kar tîne.

Rêbazên ku felsefe wan bi kar tîne, ji rêbazên zanistan cuda ne. Felsefe wekî zanistên xwezayî û zanistên civakî, ne xwediya rêbazên zanistî ye; mîna, rêgezên bîrkariyê xwedîqadên lêkolînên xwecih in. Ev nayê wê wateyê ku di felsfeyê de, tu rêbaz tune ne, lê belê ji dema Arîstotales û heta roja îro, bi rêbazên hiş, birêvebirina hizir û hizirandinê tev digere. Ev rêbaz, bi sedên salan hatine pêkanîn û ji aliyê hin fîlozofan ve, hatine sazûmankirin.

Pirsgirêka hemû zanistan, ji bikaranîna şaş a rêbazên zanînê, derdikeve. Dema ku qadên zanist û felsefeyê, rêbazên şaş ên ne li gorî xwezaya civakê bi kar bînin, rê li ber aloziyên civakî û gerdûnî vedikin.

### 1- Rêbaza danzayînê (mayotîkê):

Ev rêbaz ji aliyê **Sokrates** ve hatiye bikaranîn. **Sokrates** wiha bawer dike ku rastî di mirov bi xwe de ye, lê divê alîkariya wî bê kirin da ku wê zanînê derxîne; ango ji xwe peyda bike. **Sokrates** ji rêbaza xwe gelekî bawer bû, ew li pêşiya komeke mirovan radiwestiya, xwe li nezaniyê datîne û pirsan ji kesên derdora xwe dikir. Armanca wî, bersiva rast û durist ji devê wan bigire. Di nava hemû pirsên wî de peyvên mîna: **belê**, **erê**, **çima**, **çawa** û hwd, dihatin bikaranîn. Ev rêbaz, weke rêbazeke biguman hatiye nirxandin.

## 2- Rêbaza dahûrandinê (Analîtîk):

Mirov dikare bibêje ku ev rêbaz ji despêka felsefeyê ve, tê bikaranîn. Ev rêbaz di bingeha xwe de, giştîbûnekê ji parçeyên biçûk, vediqetîne û li ser wê lêkolîn dike.

Dema ku felsefe babetekê datîne ber çavên xwe, ji hemû aliyan ve, vedikole û dadihûrîne. Ev felsefe di dema niha de, gelekî tê bikaranîn; nemaze di warê zimannasiyê de.

**Mînak:** Dema mamoste, gotineke hevdûdanî ji xwendekar re, dadhûrîne; parçe dike û her parçeyekî cuda şîrove dike. Mîna: gotina **ava-kirin**.

## 3- Rêbaza komkirinê (sentetîk):

Ev rêbaz, berevajî rêbaza dahûrandinê ye.

Li gorî vî rêbazî bi parçekirina giştî, encam û rastî dernakevin holê û her parçeyek bi tena serê xwe, wateyekê pêşkêş nake. Ji ber vê yekê, parçe di nava giştî de, watedar e; bi komkirina parçeyan, encam derdikeve.

**Mînak:** Dema ku em bixwazin pirsgirêkekê nas bikin, divê em bi şêweyekî giştî, li hemû hêlên wê binerin da ku em tê bigihêjin. Ji ber ku encam di nava giştî de, derdikeve.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Rêbazê Sokrates ê xwegihandina zanînê, çawa bû. Tu çawa dinirxînî?**

2- **Rêbazên dahûrandin û komkirinê, li gorî xwe, bi mînakan şîrove bike.**

**Wane 2**

# RÊBAZÊN FELSEFEYÎ 2

## Rêbaza nakokî-diyaliktîk:

Diyaliktîk, rê û rêbazeke hizirînê ye. Bi vê rêbazê, du dijber an jî nakok têne cem hev û yekîtiyekê pêk tînin. Di encama vê yekê de, pêşveçûnek der tê holê.

Li gorî tê gotin, ku ev rêbaz ji aliyê **Heraklîtos** ve, hatiye derxistin. Lê dema ku mirov, vê rêbazê lêkolîn dike, dibîne ku ev rêbaz bingeha xwe, ji dibistanên felsefeyî yên **Rojhilata Navîn** digire û yekem fîlozofê, ku ev rêbaz pêşkêşî mirovahiyê kiriye **Zeredeşt** e. Gerdûnê, bi şerê qencî û xerabiyê şîrove dike, ango jiyanê, mîna têkoşîna **Ahûra Mazda** û **Ahrîman**, nîşan dide. Hemû tiştên ku Zerdeşt gotine, îro zanist vê rêbazê, bi şîroveya enerjî û heyberê berdewam dike. Di diyaliktîkê de, du têgehên dijber, tez û entîtezê pêk tînin û ev her du dijber, dighêjin sentezê. Sentez jî, piştre careke din ji hev dabeş dibe û dibe tez û antîtezeke din a nû û ev pêvajo, her berdewam dike.

Ê ku ev rêbaz bi pergal kiriye, feylesofê elmanî yê navdar **Hegel** e.

**Hegel**, du tiştên ku nakok û dijber in, bi awayê tez û antîtezê, diyar kiriye

**Karl Marks** (Karl Marx) jî, vê rêbazê vediguherîne diyalektîka daringî.

A rast, divê mirov diyaliktîkê, ango nakokiyê baş binirxîne. Şîroveyên ku nakokiyê, mîna yekîtiya dijberên tuneker dibînin; hemû cîhanê vediguherînin şerê dijberan û mîna çarenûsê, li ser mirovahiyê disepînin. Ango xwezaya jiyanê mîna rewşekê ji tevlîheviyê dibînin. Ji aliyê din ve, şîroveyên ku nakokiyê bê


dijberî dibînin; cîhanê ji pêşketinê qut dikin, bi vî awayî hewl didin û digerin ku hêzeke ji derve, wan bi rê ve bibe.

Ji bo vê jî, divê em hewl bidin, ku van her du pênaseyên nexweş û kêm derbas bikin. Divê mirov nakokiyê mîna rêbazeke avaker bibîne.

**Mînak:**

Dema ku em bi çavekî diyalektîkî li mirov binerin, em ê bibînin ku mirov, bi pêşketineke nakok a xwezayî re, gihaştiye roja îro.

**Mînak:**




- **Xwezaya yekem**, nûnertiya gerdûnê dike.
- **Xwezaya duyem**, nûnertiya civaka mirovahiyê dike.

  Dema ku her du xweza digihêjin hev, **civakeke xwezayî** ya nû ava dibe. Ev civaka nû, bi diyalektîka her du xwezayên yekem û duyem ava dibe. Ji aliyekî din ve jî, her du xwezayan di nava xwe de digire.

**Mînak: Du atom H+ atomeke O =$H_2O$ (Av)**

Dema ku du atomên hîdrojenê û atomeke oksîjenê tên rex hev, hêmaneke nû ava dikin. Ji vê hêmana nû re **av** tê gotin. $H_2O$ (av) hem hîdrojen û hem jî oksîjenê digire nava xwe. Ev mînak bi xwe, mekanîzmaya çêbûna xwezayê ye û giyana wê, radixe ber çavan.

**Rêbaza yekîtiya cudahiyan:**

Ev rêbaz, di qada felsefeyê de, nû ye. Her çi qas berê li dibistanên Rojhilata Navîn, hatibe bikaranîn jî, lê belê di serdema me de, xwe mîna rêbazeke nû ya lêkolîna felsefeyê dide der. Li gorî vê rêbazê, gerdûn bi dewlemendî û cihêrengiya xwe, di nava yekîtî û ahengekê de ye. Bi gotineke din, **her hêmana gerdûnî xwediya taybetiyeke cuda ye. Ev hemû hêman, di heman demê de di nava yekîtiyekê de ne. Heke ku li cihekî kesek hebe, lê ev kes bê civak be, hebûna wê/î bê wate ye.**

Civak, ji yekîtiya cudahiyan pêk tê. Ev rêbaz, rêgeza **kirde-bireserê** napejirîne.

**Mînak:**

Atom - Mirov - Xweza - Gerdûn

Ev tiştên ku li jor hatine rêzkirin, li gorî yekîtiya cudahiyan bi sazûmaniyeke hevbeş tev digerin. Lê di heman demê de, her yek ji wan, xwedîtaybetiyên cuda ne.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Di rêbaza diyaliktîkê de, Hegel û Marks, du nerînên cuda nîşan dan e. Li gorî te, rastiya vê rêbazê di ku de ye? Diyar bike.**

2- **Civak, ji yekîtiya cudahiyan pêk tê. Çi nêzîkbûn di navbera rêbaza yekîtiya cudahiyan û sistema netewa demoqrat ku anha em li Rojava jiyan dikin de, heye?**

**Wane 3**

# TÊKILIYA FELSEFEYÊ BI ZANISTÊN DIN RE

Ji roja ku mirov hatiye ser rûyê Erdê, li wateya jiyan û hebûna xwe digere. Ev jî dibe mijara felsefeyê ya sereke. Felsfe jî li wateya her tiştî digere û hemû mijaran di nava xwe de, digre û lêkolîn dike.

Di encamê de, felsefe pirojeyeke jiyanê ye û girêdayî hemû zanistên din e û bi wan re, têkildar e.

## Têkiliya felsefeyê bi civaknasiyê re:

Mijara civaknasiyê ya sereke, lêkolînkirina xwezaya civakî ye. Bi rêya van lêkolînan, têkiliya mirov bi civaka ku tê de dijî, nas dike. Felsefe jî dikeve bin xizmeta mirov û li rastiya wî digere. Ji ber vê yekê, têkiliya felsefe û civaknasiyê bi hev re heye û ji hev nayên qutkirin.

Felsefe di lêkolînên xwe de, rêbaza tewrî û hizirî bi kar tîne, lê civaknasî, rêbaza piratîkî bi kar tîne. Ew bi rêya çavdêriyê lêkolînên xwe, berdewam dike. Ji bo ku encamek durist bi dest bixe, pêwîstî bi tewriyên felsefeyê heye. Ji ber ku felsefe têkiliya mirov bi hemû afrîneran re, lêkolîn dike û rêbaza civaknasiyê di nava xwe de digre.

## Têkiliya felsefeyê bi dîrokê re:

Dîrok, ew zanista ku li rastiya bûyerên dîrokî digere, felsefe jî li her sê demên bûrî, niha û pêşerojê dikole, armanaca her du aliyan jî naskirina dîrokê ye.

## Çima girîngiya dîrokê di felsefeya dîrokî de, diyar dibe?

Pêdiviya dîrokê bi hişê mirov heye; nemaze hizira fîlozofan, ji ber ku mirov bi rêya hizira xwe, dikare bûyerên dîrokî vegerîne û lê bikole. Ew li rastiya dîrokê digere, fîlozof jî hewil dide hemû sedemên bûyerên dîrokî, nas bike. Ji ber vê yekê, dîrok û felsefe ji hev ne dûr in. Ev têkilî jî di felsefeya dîrokî de, diyar dibe ku felsefe girîngiyê dide bûyerên dîrokî û bi rêya hizira felsefeyî, dixwaze wan bûyeran şîrove bike.

## Têkiliya felsefeyê bi perwerdeyê re:

Di navbera felsefe û perwerdeyê de, têkiliyek nêz heye û hev temam dikin. Ji serdemên kevin heta roja îro jî fîlozof girîngiyê didin felsefeyê û bi felsefeya perwerdeyê, lêkolînên xwe temam dikin.

## Çima felsefe û perwerde ji hev ne dûr in, ango girêdayî hev in?

Dema ku felsefe, ji perwerdeyê dûr bikeve, wê bibe komikeke ji tewriyên hişk û bêbandor. Pêdiviya perwerde jî bi tewriyên felsefeyê heye, ji ber ku tewriyên felsefeyê, dibin alîkarê armancên civakê û çalakiyên mirovî yên jiyanî.  Her wiha di hemû deman de, li pey pirsgirêkên civakî dikeve û çareyan ji wan re peyda dike.

**Felsefeya perwerdeyê**, ji hemû saziyên perwerdeyê re dibe bingeheke sereke. Ew sîstemeke taybet bi perwerdeyê, pirensîbên nirxandinê û pirensîbên girêdayî birêkûpêkiya birêveberinê. Her wiha armanca rêbazên perwerdeyê dest nîşan dike.

Bi giştî, felsefeya perwerdeyê hevsengiyê dixe navbera mirov û jîngeha wî û dibe alîkarê guhertina civakê.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Çima felsefeya perwerdeyê, hevsengiyê dixe navbera mirov û jîngeha wî?**

2- **Bi nerîna te, çima mijarên felsefeyê û civaknasiyê yek mijar in?**

# BEŞA ÇAREM
# HIN MIJARÊN FELSEFÊ

## Waneyên beşê

1- Felsefeya hevjiyana azad
2- Felsefeya hiş û mengîweriyê
3- Felsfeya zanînê(Epîstemolojî)

**Wane 1**

# FELSEFEYA HEVJIYANA AZAD

## Gelo armanca me ji jiyanê çi ye?

Beriya ku pênaseyek ji pêşketina xwezayî re bê dayîn û heta digihêje jiyana mirovî, divê ev jiyan, rêjeyî were pênasekirin. Her wiha divê mirov armanca jiyanê, bixe ber lêpirsînê**. Em çima hene, em çima dijîn, jiyan çima xwe dewam dike**, **xwe xwedî dike û bergiriya (parêzî) xwe dike?** Eger mirov bersiveke wiha bide : Mirov ji bo jiyanê, xwe xwedî dike, bergiriya xwe dike û xwe zêde dike, bê guman ev bersiv seqet e; ango kêm dimîne. Ji van pirsan, pirsên girîngtir jî hene, ew jî ev in:

**Em çima zêde dibin, em çima bergiriya xwe dikin?**

Heger bersiva me "ji bo jiyanê tenê be", ev jî nabe bersiv û mirov xwe dixe gerînekeke girtî. Pêdiviya bi zanîn û naskirinê bi temamî têra danasînê nake, lê hinekî raza jiyanê eşkere dike.

Hebûn bi aliyekî tenê û bi yek zayindê re, kêmwate ye, seqet dimîne û berdewam nake. Di mirovahiyê de jî bi hebûna jin û mêr, jiyan berdewam dike; her du girêdayî hev in û hev temam dikin. Ew dibin hevparê hevjiyaneke azad, ku tê de hezkirin û rêzgirtinê bingeh e.

## Hevjiyana azad çi ye?

Di navbera her du zayindan de, dibe bingeha avakirina jiyaneke hevbeş û têkilî û erkên wan di nava civakê de, diyar dike. Her wiha yekîtî û hevtemamkirinê jî bi xwe re, ava dike.

**Mînak:**

Heke gerdûn mîna baxçeyekî be, bi gul, şênayî û darên xwe yên cur bi cur, temam dibe. Ji bilî wilo, geşbûn û xweşikbûna xwe, winda dike.

## Armanca felsfeya hevjiyana azad çi ye?

Ji bo naskirina rastiyên ku di gerdûn û jiyanê de hene, xwegihandina jiyana hevbeş, sererastkirina civaka mirovahiyê, jinavhevderxistina pirsgirêkên civakî û çarekirina wan, pêngava yekem ew e ku mirov li hevjiyana azad vegere. Gelek fîlozofan, mînak di vî warî de dane, lê damezrînerê vê felsfeyê, **Ebdullah Ocelan** e.

## Çima pêwîstî bi hevjiyana azad heye?

Pirsgirêkên ku rojane di nava civakan de derdikevin, bêtir ji encama nakokiyên ku di navbera jin û mêr de ne. Bi derketina dewletê re, ev pirsgirêk derdikevin pêş û nirxên jiyanî li gorî berjewendiyên dewletê tên guhartin. Ji ber vê yekê, divê mirov beriya her tiştî têkiliya di navbera jin û mêran de, nas bike. Her wiha jinê bide nasîn û rola wê ya di nava jiyana civakî de jî diyar bike.

Têgîna jinê, weke hebûn girîng e. Mirov çi qasî jinê pênase bike, pênasekirina mêr jî ew qasî pêkan, dibe.

Jin nîvê civakê ye û nîvê din jî perwerde dike; hem dayîk e, hem xwişk e, hem hevjîn e û hwd.  Mêr jî bi vî awayî hem dibe bav, hem jî dibe bira û hwd. Bi vê yekê, her yek ji wan li gorî hêz

û biyolojiya xwe tev digere û erkên xwe pêk tîne.  Li gorî encama lêkolînên zanistî, tê dîtin tevî ku cudahî di navbera biyolojiya mêr û ya jinê de jî heye, enerjiyeke pir li cem jinê heye. Jêdera vê enerjiyê jî ji jîrbûna hestyariya jinê ye. Ev enerjî jî bi derketina sîstema deshilatdariyê re, veşartî maye û derî lê hatiye girtin. Lewra pêdiviya wê bi herikînê heye, ji bo karibe pêşketinên cur bi cur di jiyanê de, biafirîne. Enerjiya jinê, weke çemê avê ye; her tim diherike.

## Hevjiyana azad çawa pêk tê?

Bi qasî ku hevjiyana azad, jinê dike mijara xwe ya sereke, mêr jî di nava xwe de, digire û dike mijara xwe. Lê ji ber ku mêr di nava kelepçeyên deshilatdariyê de ye û koleteyê dijî, vê rastiyê nabîne. Ji ber vê yekê, pêdiviya hevjiyana azad,  bi rizgarkirina her du zayindan ji hev re heye.

Mercê sereke ji bo hevjiyana azad, vîna azad a ku li cem her du zayendan e. Divê yek ji wan vîna yê din tune neke. Ji ber vê yekê jî kengî ku di civakeke erênî de, mêr  perensîbên xwe bi pêş bixe û xwe ji wê hizira deshilatdar rizgar bike, wê çaxê hevjiyana azad jî pêk tê.

.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Gelo tu hevjiyana azad di civaka xwe de, dibînî? Nerîna xwe, bi mînakan bîne ziman.**
2- **Hevjiyana azad çawa pêk tê?**

Wane 2

# FELSEFEYA HIŞ Û YA MENGÎWERIYÊ

## Felsefeya hiş:

Şaxek ji şaxên felsefeyê ye û mijara wê ya sereke aqil e. Bi awayekî felsefeyî xwezaya aqil, bûyer û taybetiyên girêdayî hizir û têkiliya ku di navbera aqil û laş de heye, şîrove dike.

## Aqil çi ye?

Li gorî lêkolînên ku hetine kirin, ji bilî ji sedî 2-3, ji aqil nehatiye bikaranîn ji ber vê yekê pênaseyek destnîşankirî, jê re nehatiye danîn. Lê mirov dikare wî wiha pênase bike: Komek ji karînên girêdayî têgihaştin, nirxandin, bîranîn û biryardayinê ne ku bandora xwe li hest, hizir, ajo û xwestekên mirov dike. Her wiha taybetiyên girêdayî kesayetê jî dide diyarkirin.

Tevî ku heta niha ji bilî ji sedî 2-3, ji aqil nehatiye bikaranîn, ew qas pêşketin û guherîn di cîhanê de, çêbûne. Gelo ji wê rêjeyê bêtir bê bikaranîn, wê çawa be?

## Diwane:

Ew nêrînên ku derbarê têkiliya di navbera aqil û laş de ne.

Yekemîn car, dema ku ev hizir pêk hat, didît ku carinan piroseya (kiryar) aqil ne fîzîkî ye. Ev hizir li dibistanên felsefeyê yên li Rojhilatê bi taybet li Hindistanê, derket pêş. Li Rojavayê jî yekemîn kesê ku diwane giftûgo kir, Platon bû. Dîkart (Descartes) jî bi wê hizirê navdar bû. Bi nerîna wî, aqil ne di çarçoveyeke heyberî de ye. Her wiha yê yekemîn e ku têkiliya aqil bi têgihaştinê re, diyar kiriye û ji mejiyê ku dibe bingeha zîrekiyê, daye xuyakirin.

## Felsefeya mengîwerî (îdealîzm):

## Çi wateya felsefeya mengîweriyê ye?

Ew felsefe, aqil bingeh digire; her tiştî di gerdûnê de, vedigerîne aqil.

Dibêje ku jêdera tekane ji zanînê re, aqil e û hizir ji beriya heyînê de heye. Her wiha bingeha her tiştî di gerdûnê de hizir e.

Kokên felsefeya îdealîzmê, pir kûr û bingehîn in, lê weke nêrîneke felsefeyî, xwe dispêre felsefeya Yûnanistanê ya dema destpêkê. Di wê demê de, ji aliyê **Platon** ve, tê bipêşxistin. Di dîroka felsefeyê de, mengîwerî (îdealîstî) weke şaxekî bingehîn ê hizira felsefeyê ye.

Di encama vê yekê de, gelek rêbazên mengîweriyê derdikevin û ew jî ev in:

**1- Mengîweriya entolojî:**

**Platon,** dibe damezirînerê vê rêbazê. Bi nêrîna wî, cîhaneke mezin tijî ramanên rast ên mengîweriyê, heye. Ev raman û bawerî, ji derveyî cîhana mirovî ne û ne tenê di aqil û hizirê de, cih digirin.

**2- Mengîweriya neheyberî:**

Damezrînerê vê rêbazê Corge Berkeley **(Corc Bîrkilî**) ye.

Li gorî vê rêbazê bûyer û heyînên heyberî yên em dibînin û dijîn, rastiya wan tenê di hizirandina mirov de ye, bi rêya aqil derdikevin û ew jî girêdayî hizira xwedê û xwezayê ye.

**3- Mengîweriya rêjeyî:**

Bi navê mengîweriya bilind tê nasîn.

Damezrînerê wê **Kant** (Emmanuel Kant) e. Bi nêrîna vê rêbazê, her tiştên ku em li ser vê cîhanê dizanin, çi bawerî û çi têgehên heyî, bi giştî ji encama hizirê ne. Ew zanîna ku digihêje

mirov, ne di naveroka tiştan de ye, tenê di aqil û têgihaştinê de ye.

**4- Mengîweriya kirdeyî:**

Damezirînerê wê Fytshtfy (Fîtşê) ye. Ev rêbaz hebûnê bi kes ve girê dide. Bingeha wî, her tişt bi min heye; ez çi bim an jî çawa bimînim, rastî di wir de ye.

**5- Mengîweriya bireserê (objektîf):**

Damezirînerê vê rêbazê, Schilling (şîlnîg) e. Sedema hebûna her tiştî û mercên hebûnê bi hizireke xwezayî ve ku ji beriya hebûna mirov de heye, girê dide.

**6- Mengîweriya bêsînor:**

Damezirînerê vê rêbazê Hegel (Hîgil) e. Li gorî bingeha vê rêbazê, hizirên ku di aqil de û heyînên di cîhana heyberî de, weke hev in. Hegel dibîne ku aqil di nava pêşketinê de, berdewam dike û bi pêşketina aqil re, pêşketina cîhana heyberî jî pêkan e.

Hin rexneyên ku li felsefeya mengîwerî hatine kirin:

1- Ew felsfeyeke tewrî ye, bêtirî ku piratîkî be.
2- Di civakê de cudahiyê dixe navbera mirovan.
3- Nakokiyê dixe navbera nirxên nifşên kevin û yên  nû.
4- Her tiştî vedigerîne hêzeke ji derveyî gerdûnê û bi vê yekê, mirov bi vîneke lawaz tev digere.
5- Girîngî daye giyan bêtir laş.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Mijara felsefeya hiş çi ye û li ser çi lêkolîn dike?**

2- **Felsefeya mengîweriyê şîrove bike.**

Wane 3

# FELESEFEYA ZANÎNÊ (EPÎSTEMOLOJÎ)

## Epîstemolojî:

**Peyvek yûnanî ye, ji du beşan pêk tê; episteme tê wateya zanînê û logos tê wateya zanistê û bi hev re dibe, felsfeya zanînê yan jî zanista zanînê.**

Şaxek ji şaxên felsefeyê ye; zanisteke ku li ser bingeha zanîn û agahiyan, dikole û hewil dide bersiva pirsan bide.

**Bi pirsên wekî:**

**Zanîn çi ye?**

**Çawa zanîn bi pêş dikeve?**

**Armanca zanînê û çavkaniya wê çi ye?**

Bi van pirsan û gelek pirsên girêdayî zanînê mijûl dibe û bi van pirsan, li bersiva pirsgirêka zanînê digere.

Lêkolînên wê bêtir li ser analîzkirina siruşta zanistê û şêweyê bidestxistina wê ye. Her wiha li ser peywendiya wê bi rastiyê re, radiweste.

Zanîn, weke encama ku ji têkiliya mirov, xweza û civakê derdikeve hole; felsefeya zanînê jî vê têkilî û pirsgirêka hebûnê, lêkolîn dike.

Pirsgirêka felsefeya zanînê, ji demên destpêkê heta roja me, guftûgo û lêgerên bersivan hebûn, heyîn û zanînê, berdewam dike.

**Pirsgirêka gihaştina zanîna rast:**

**Pirsên mîna zanîna rast heye, yan na?**

**Derfeta xwegihandina zanîna rast heye, yan na?**

Ev Pirsên bingehîn ên felsefeya zanînê ne. Ji bo van pirsan, du nerîn hatine dayin.

**1- Nerînek dibêje:**

Derfeta gihîştina zanîna rast heye. Ev nerîn, weke **hişkebawerî** tê binavkirin.

**2- Nerîna din jî dibêje:**

Derfeta gihîştina zanîna rast tune ye. Ev nerîn jî weke **gumantî** tê binavkirin.

**Nerînên li ser gihandina zanîna rast:**

**a- Gumanparêz:**

Nerîna ku dibêje, mirov nikare xwe bigihîne zanîna rast; ango derfetên zanîna rast tune ne. Ji fîlozofên ku vê nêrînê diparêzin re, **gumanparêz** tê gotin. Ev fîlozof dibêjin, negengaz e ku em tiştan zanibin û bibin xwediyê agahiyên rast. Hişê mirov, an jî pêhesînên wî, nikarin di rastiyê de bigihêjin. Gotina bi nav û deng a fîlozof Descartes (Dîkart) jî ev e:"**Ez dihizirim, Nexwe ez heme"**

Li gorî vê nêrînê, ji bo girtina zanînên rast, pêwîstî bi rênîşanekê heye. Her tim gumanê bi pêş dixe. Sedem jî bi vî awayî tê nirxandin. Pêhesînên me di pêvajoya agahîgirtinê de, pirî caran, me dixapînin. Ji ber vê yekê, nikarin encama dawî bidin. Bi kurtasî, ev nerîn derbarê zanînê de, tu darazan napejirîne.

**b- Hişkbawerî:**

Li dijî gumanê derdikeve. Di dîroka felsefeyê de, piraniya hizirvanan diyar kirine ku xwegihandina zanîna rast, gengaz e. Ev hizirvanên ku gengaziya zanîna rast diyar kirine, derbarê çavkaniya zanîna rast de, nerînên cuda cuda dane pêş. Ji nerîna ku bi giştî dibêje, gihîştina zanîna rast gengaz e re, **hişkebawerî** tê gotin. Li gorî vê, zanînên me, tekez û bê sînor in. Ji derveyî çarçoveya agahiyên mirov, tu mijarên din tune ne û nabin. Hemû zanînên me misoger in, em dikarin ji sedî sed, jiyanê binasin.

Di encamê de, hişkbawerî, jiyanê kelepçe dike û mirovên kor ava dike. Di hemû pêvajoyan de, girtina zanîna rast, bûye navenda xebatên mirovan. Bi rastî jî rastdîtin û têgihiştin ji bo zanîna rast pir girîng in. Naskirina xwe û hawîrdora xwe, weke hewldana mirovahiyê ya herî binirx pêk hatiye û ev naskirin ji bo guherîn û veguherîna jiyana mirovahiyê, pêwîst e.

Ji ber vê sedemê, serkeftina zanînê dibe nasîn û têgihaştina xweza û gerdûnê ya serdema ku tê jiyan.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Armanc û mijara epîstemolojiyê çi ye?**

2- **Li gorî gumanparêzan, hişê mirov an jî pêhesînên wî, nikarin di rastiyê de bigihêjin. Bi hevalên xwe re giftûgo bike.**

3- **Bi nerîna te, mirov dikare bigihêje zanîna rast? Li ser vê mijarê bihizire.**

# BEŞA PÊNCEM
# DERÛNNASÎ

## Waneyên beşê

1- Derûnnasî û despêka wê
2- Qadên derûnnasiyê
3- Kesayet û pêkhateyên wê
4- Karîgerên ku bandorê li kesayeta mirov dikin

# DERÛNNASÎ Û DESPÊKA WÊ

## Pênaseya derûnnasiyê:

Ew zanista ku **diyardeyên derûnî** **ango** **reftar û tevgrên mirovan ên berbiçav û dikarin werin pîvan lêkolîn dike.** Bi armanca têgihaştina xwezaya mirov, naskirina bandora jîngehê li reftarên wî û pêşinyarkirina çareyan ji pirsgirêkên derûnî re.

**Reftar**, ew çalakiyên heyberî mîna **tevger** an jî rezberî mîna **hizirîn** ku ji ber dan û stendinên mirov bi dorhêlê re, derdikeve holê.

ne tenê tevgerên mirovan lêkolîn dike, lê tevgerên lawiran jî vedikole. Derûnnasî wan di warê ezmûnkirinên xwe de, bi kar tîne û ji encama wan ezmûnkirinan, sûdê li mirov vedigerîne.

Di encamê de, derûnnasî xwezaya mirov dixwîne, şirove dike, girîngiyê dide her tiştê ku bi zanistên din re têkildare û reftarên mirovî ji xwe re bingeh digire.

## Gelo, têkiliya derûnnasiyê bi zanistên din re heye yan na?

Zanistek bi tena serê xwe, bêyî ku bi zanistên din re bikeve hevkariyekê, nikare bûyer û diyardeyên ku vedikole, ronî bike. Bi taybetî jî ji bo zanisteke wek derûnnasiyê, mirov dikare bibêje ku ev yek nepêkan e. Derûnnasî ji bo misogerkirin û peydakirina encamên xwe, pêdivî bi hevkariya zanistên din heye.

## Despêka derûnnasiyê:

Bêguman, derûnnasî ji destpêka mirovatiyê de heye. Destpêka wê destpêkeke felsefeyî ye û gotina ku dibêje felsefe dayîka hemû zanistan, vê yekê tekez dike.

Ji serdemên kevin de, fîlozofan dixwestin xwe bigihînin wê yekê û naveroka derûnê nas bikin û li bingeh û çarenûsa wê dipirsîn.

Weke mînak, pêşengên felsefeyê derûn wiha şîrove kirine: **Fîsagoras,** dibîne derûn hêmanek e ji laş cuda ye û di mejî de, bi cih dibe. Her wiha **Platon**, li ser derûnê digot: "Derûn ji laş kevintir e".

**Derûnnasî,** ji zanistên kevin e ku çavdêriya karîn û reftarên mirov di çarçoveya mîtolojiyê de, dikir. Ev yek di mîtolojiya şaristaniyên mîna; **Rojhilata Navîn (Mezopotamiya, Misir, Hindistan, Çîn, Şaristaniya Yûnanistanê...)** derketibû holê.

## Derûnnasî kengî ji felsefeyê cuda bû?

Ji despêkê de, derûnnasî beşeke ji beşên felsefeyê bû û li ser mijarên derûnî dixebitî. Lê ji despêka derketina rêbaza ezmûnî bi derketina dibistanên felsefeyî û aliyên ciyawaz, di sedsala 19'an de, li ser destên **Vont** ji felsefeyê cuda bû. Yekemîn taqîgeha derûnî, li ser destên **Vont,** hate damezirand û bandora wî li hizirên derûnnasiyê demek dirêj dom kir.

## Hin qonaxên pêşketina derûnnasiyê:

1- **Qonaxa giyanî:** Di wê demê de naskirina derûn û giyan tevlihev bû û ji nav hev nedihat derxistin.

**Mînak: Sokrates** digot:" Xwe nas bike." Piştre têgîna derûnê li ser destên şagirtên wî bi pêş ket.

**2- Qonaxa hişmendî:**

Di serdema navîn de, kesên ku lêkolîn li ser mirov dikirin, dabeşî du beşan dibûn.

Beşekê li ser giyan û yê din jî li ser hiş lêkolîn dikir. Lê di despêka serdema nû de, **Descartes** (Dîkart), laş û derûnî ji hev cuda kirin û got ku **livika çamî** di mejî de, **hiş**, **derûn** û **laş** bi hev girê dide û serpereştiyê li ser hemû piroseyên hişmendî, mîna têgihaştin, hest û hizirkirinê, dike.

**3- Qonaxa hestiyariyê:**

Bi pêşketina derûnnasiyê re, rêbazên lêkolînê jî bi pêş ketin. Bi vê pêşketinê re, mirov xwe spart rêbaza **hizirkirina hindirîn (Introspection)**. Bi vê rêyê mirov hest, xwestek, hewesên xwe diyar dike. Mînak: Nexweşê ku êşa xwe ji bijîşk re dibêje, her wiha xwendekarê ku hestê serkeftina xwe tîne ziman. Ev qonax, bi navê zanista hestyariyî, dihat nasîn.

**4- Qonaxa reftarî:**

Ji ber ku rêbaza **Introspection** (naskirina tiştên hundirê mirov) li ser zarok û kesên mezin ên ku ji aliyê derûnî û hişmendî ve, nedurist in zehmet bû ku bê bikaranîn, her wiha ne hêsan e lêkolîner tiştê hundirê wan nas bike, xwe spart şopandina **reftar** û reftar jî bû mijara derûnnasiyê. Ji wê demê û pê ve, li ser destê Vont, di sala 1879'an de, di warê derûnnasiyê de, rêbazê ezmûnkirinê derket pêş.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Kengî û li ser destên kê, derûnnasî ji felsefeyê cuda bû?**

2- **Qonaxên pêşketina derûnnasiyê diyar bike û qonaxa hişmendî şîrove bike.**

# QADÊN DERÛNNASIYÊ

Bi pêşketina derûnnasiyê û berfirehbûna lêkolîn û mijarên wê re, pêwîstî bi destnîşankirina armancên wê çêbû û divyabû ku her mijarek, cuda cuda bê lêkolînkirin. Ji ber vê yekê, şaxên derûnnasiyê pir bûn û dabeşî du qadan bûn; tewrî û piratîkî û mijarên xwe ji nav hev cuda kir.

## Qadên tewrî:

Bi armanaca têgihaştina reftarên mirov ên cur be cur, dixebite. Qadên tewrî dabeşî gelek şaxan dibin û hin ji wan şaxan jî ev in:

### 1- Derûnnasiya cudahiyê:

Cudahiya di navbera kesan, koman an jî di ola wan de, ji aliyê jîrikî, kesayet, bîr û ramanên geş hwd, lêkolîn dike û bi awayekî derûnî, sedemên van cudahiyan eşkere dike. **Mînak:**

Cudahiya di navbera du şagirtan de, ji aliyê asta zîrekî û têgihaştina wan de.

### 2- Derûnnasiya lawiran:

Reftarên lawiran ên cur be cur lêkolîn dike da ku di encamê de, ev lêkolîn bibe alîkarê têgihaştina reftarên mirov.

**Mînak:** Dema çavdêrî li lawira mê bê kirin ku çawa parastina çêlîkên xwe dike, wê çaxê tê naskirin ku di mirovbûnê de, dayîk jî wiha parastina zarokên xwe dike, ji ber ku hormonê **Birolaktîn** di qonaxa dayîkbûnê de, zêde dibe.

**3- Derûnnasiya hevrûkirinê:**

Di navbera reftarên mirov û yên lawiran, zarok û mezinan, kesên despêkê û yên pêşketî de…hwd, hevrûkirina derûnî, pêk tîne.

**4- Derûnnasiya civakî:**

Ji têkiliya ku di navbera derûnnasî û civaknasiyê de heye, şaxeke nû ji derûnnasiyê derket; ew jî derûnnasiya civakî ye.

Ew zanista ku civakê li ber çav digire, reftarên mirov ên ji encama têkilî û danûstendinên wî bi civakê re derdikevin, lêkolîn dike û bi awayekî zanistî şîrove dike. Her wiha reftarên civakê bi giştî nas dike da ku civakeke pêşketî û bîrewer, bê avakirin. **Mînak: Dema ku dijmin di nava civakan de şerê taybet dimeşîne, derûnnasiya civakî berevaniyê dike û vê yekê çare dike.**

**Qadên piratîkî:**

**1- Derûnnasiya perwerdeyê:**

Girîngiyê dide têkliya ku di navbera mamoste û xwendekarên wî heye û çalakiyên wan ên di polê de. Çawaniya pêşxistina asta xwendekan û çalakiyên wan lêkolîn dike.

**2- Derûnnasiya bazirganî:**

Derûnnasiya kirîn û firotina li bazaran, hewes û xwestekên kesên kiryar, çêkirina piropoganda, rêbazên dan û stendina ku di navbera firoşkar û kiryar de heye û hwd, lêkolîn dike.

**3- Derûnnasiya Iklînîkî:**

Ev zanist, bi taybet nexweşiyên derûnî, aqilî, pirsgirêkên sîpeyan, reftarên mirovên durist û nedurist lêkolîn dike û çareyên guncaw, li gorî rewşa wan pêşinyar dike.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Mijarên ku derûnnasiya civakî lêkolîn dike çi ne? Bi mînakeke jiyanî şîrove bike.**

2- **Qadên piratîkî yên derûnnasiyê, bide diyarkirin.**

# KESAYET Û PÊKHATEYÊN WÊ

## Têgeha kesayetê:

Di jiyana me ya rojane de, têgeha kesayetê pir li ser ziman digere. Mina: Ev kes, çi kesayeta wî bibandor e**,** ango balkêş e yan jî ev kes çi xemgîn e… Lê nêrîna zanistî di kesayetê de, cuda ye û girîngiya wê di lêkolînên derûnnasiyê de, diyar dibe. Ji ber vê yekê jî lêkolînên derûnnasiyê yên nûjen, hemû aliyên kesayetê, dikin mijarên xwe.

Heta niha, pênaseyeke taybet ji kesayetê re, nehatiye danîn û her derûnnasekî, li gorî xwe ew şîrove kiriye.

*__Immanuel Kant dibêje:__ Kesayeta durist ew kesayeta sincî ye û bi bîr û nirxên mirov ve, girêdayî ye.

***Li cem Descartes:** Kesayet tenê bi hizira mirov diyar dibe, ji ber vê yekê dibêje: "Dema tu ji hizirê dûr dikeve, tu tune dibe; ango heyîna te namîne".

***Watson:** Kesayet, ji encama perwerde û fêrkirinê ye. Dibêje**:** "Deh zarokên saxlem bidin min, ez ê qelsê wan hilbijêrim, perwerde bikim. Ji bilî taybetiyên wan yên zikmakî, ez ê wan li gorî xwe bikim hunermend, zanyar, bazirgan, diz an parsek."

## Kesayet ji çi pêk tê?

Piraniya derûnnasan dibêjin ku kesayet, ji pergala mirov a derveyî weke; durûv, dirêjî, reng… û ya hundirîn wekî; zanîn, têkiliyên civakî, karînên wî û hwd, pêk tê. Ev bi giştî jî hev û du temam dikin û bi hev bandor dibin.

## Ev pêkhate jî ev in:

**1- Pêkhateyên laş:**

Weke dest, çav, rû, guh û poz… Ev hemû girêdayî teşeyê mirov ê derveyî ne.

**2- Pêkhateyên hiş:**

Mirov bi hişê xwe dihizire, bîr dibe, zanînê bi dest dixe û dikare têkiliyê bi derdoran re, bike.

Jîrikî, balkişandin, têgihiştin, bîrhatin…. Ev bi giştî taybeiyên hiş in ku mirov jiyana xwe pê berdewam dike.

**3- Pêkhateyên hilçûnê (Reakisyon):**

Ew hestên ku ji hundirê mirov, li hember rewşekê yan jî helwestekê  derdikevin û bertekê didin. Mînak: tirs, hezkirin, xemgînî...

**Mînak:** Bi bihîstina nûçeyeke xemgîn, hestê xemgîniyê li  ser rûyê mirov xuya dibe, yan jî tirsa ku ji dengê tav û birûskê li cem zarok derdikeve.

**4- Pêkhateyên civakî:**

Jîngeha ku mirov lê dijî û mezin dibe,  bandorê li kesayeta wî dike. Ev jî di reftar, danûstendin û tevgerên wî de, diyar dibe.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Wateya kesayetê li gorî nerîna te, çi ye?**

2- **Li gorî Watson, çi bandora perwerdeyê li kesayetê heye?**

**Wane 4**

# KARÎGERÊN KU BANDORÊ LI KESAYETA MIROV DIKIN

**Gelek karîger, bandora xwe li  kesayeta mirov dikin û ji wan:**

Karîgerên laşî, karîgerên malbatî û perwerdekirinê, karîgerên jîngehî.

**1- Karîgerên laşî:**

Di rêya gelek hêmanan re, bandora xwe li ser kesayeta mirov dike. Mînak: paşmak, mejî, pergala sinirê ya navendî, derkirina hormonan, pergala laş ya derveyî (dirêjî, kinî, reng, xweşikbûn…)  û damar bi hemû cureyên xwe.

**2- Karîgerên malbatî û perwerdekirinê:**



Di avakirina kesayeta zarokan de, malbat roleke mezin dilîze. Ji ber ku di salên despêka jiyan zarokan de, tiştên ku bi dest dixin bi demek dirêj bi wan re, dimînin û dibe ku bi zehmetî bên guhertin. Ji aliyê nirx û baweriyên xwe ve jî bi dê û bav bandor dibin. Her wiha rewşa aborî, civakî, çandî… bandora xwe li kesayetê dikin.

## Çi bandora perwerdekirinê li kesayetê heye?



Dema zarok derbasî qonaxa perwerdekirinê dibin, jiyana wan tê guhertin; ji civakeke desnîşankirî derbasî civakeke berfirehtir dibin û ew jî dibstan e. Ew dibistan bandorê li reftarên wan dike û sîstemeke nû ji jiyana wan re, datîne.

Di qonaxa perwerdeyê de, zanîn û zanistên ku bi dest dixin; nirx, karîn, bawerî, ramanên wan  bi pêş dikevin û bandorê li reftarên wan dike.

**3- Jîngeh:**

Erdnîgariya cih û dorhêlê, bandoreke wê ya xurt, li reftarên mirov heye. **Mirovên ku di jîngeheke bi dar û ber de, bijî, ne wek mirovê ku di şkeftekê yan jî di daristanekê de bijî**. Wiha nirxên di nava civakan de, belavbûyî weke mîtolojî, pendên civakî, kevneşopî, çanda xwarinê, bandora wan bi giştî li kesayetê heye, heta pîşeya mirov jî bandora wê heye û kesayeta wî diyar dike. **Mînak:** Dema ku tu bi bijîşkekî re, yan jî parêzerekî re, têkiliyê bike, di reftarên wî de, tê xuyakirin.

**Dezgehên ragihandinê** jî, roleke girîng di kesayeta mirov de, dilîzin û bandorê lê dikin, hem bi şêweyekî erênî û hem jî bi şêweyekî neyinî.

Bi giştî, hemû karîgerên ku di civak û jîngehê de, peyda dibin, dikarin kesayeta mirov bi rêya têkiliyên wî bi civak û erdnîgariya cih re, desnîşan bike.

Di encamê de, em dibînin ku avabûna kesayetê ji bandorên paşmak, malbat, perwerde û jîngehê pêk tê.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Çi bandora malbatê li kesayetê heye?

2- Bandora dezgehên ragihandinê bi her du aliyên xwe; yên erênî û neyinî, bide diyarkirin.

## Belavkirina Waneyan Li Ser Sala Xwendinê

| Heftî / Meh | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | Hizira felsefeyî li Rojhilatê | Zeredeşt 1 |
| Cotmeh | Zeredeşt 2 | Manî | Hizira felsefeyî ya kevin li Misirê 1 | Hizira felsefeyî ya kevin li Misirê 2 |
| Mijdar | Hizira felsefeyî ya kevin li Hindistanê | Hizira felsefeyî ya kevin li Hinistandê | Hizira felsefeyî ya kevin li Çînê | Hizira felsefeyî ya kevin li Çînê |
| Berfanbar | Fîlozofên xwezayê | Fîlozofên hejmarê (Pythgoras) | Felsefeya mirovî 1(Sofîzim) | Felsefeya mirovî 2(Sokrates) |
| Rêbendan | Lêveger | Lêveger | Bêhinvedan | Bêhinvedan |
| Reşemeh | Platon (427-347) B.Z | Eristo (384-322) B.Z | Rêbazên felsefeyê 1 | Rêbazên felsefeyê 2 |
| Avdar | Têkiliya felsefeyê bi zansitên din re | Felsefeya hevjiyana azad | Felsefeya hiş û ya mengîweriyê | Felsefeya zanînê (Epîstemolojî) |
| Cotan | Derûnnasî û destpêka wê | Qadên derûnnasiyê | Kesayet û pêkhateyên wê | Karîgerên ku bandore li kesayeta mirov dikin |
| Gulan | Lêveger | Lêveger | | |